

azadî

KOVARA MARKSÎSTA KURDÎ



*ji azadî û serxwebûnê kirûmettir
tistek nîn e. (Ho Chi Minh)*

hejmar 8-9 Tlon-cetmeh 1979

KURDISTANA ÎRANÊ:

Carna foto ji bendên dirêj çêtir hin rewşan nîşan dikin. Di qalpxên hejmeta dawîna Azadî yê û ya tîcar da, bi kurtî guhêrandin û qewimandinên van demên dawîna rind tîna xwendinê. Do, Kurdistan bihareke azadî û şahiyê dijî. Bajarekî kurdî de destên şûrayên şoreşgerên kurdîna helbijartî de bûn; ji leşker, cendirme û polîsên îranî azadkirî bûn. Pêşmergekî kurdî, gundî û bajarîyên çekdar, serbest, serbilind û dilşa di kuçê û kolanan da dimeşîyan. Partî û komeleyên ji her bîr û bawerîyên siyasî dinnav serbestî û demokrasîyeke qet nedîtî dixebitîna, xwîneke gurr û nû didan laşê xewarê civakê. Kurdistanîna Îranê tîcarî jîndartîyeke wîlo ne dîtîbû.

Iro xêlîya zordestiyê ji nû ve bajarekî Kurdistanê dinixême. Pêmergekî piştî 18 rojên şerê jîbo parastîna bajarîna firekîşîyan deşt û çîyan. Xwe jîbo şerê gerillayê, şerekî dûr û dirêj hazîr dîkin. Rojêna şahî û firehiyê çiyê xwe ji yêna dil - tengî û dijwariyê re dihêlin. Leşkerê Îranê, Pasdar an Notîrvanêna Şoreşa îslamî ya Xomeynî di bajarêna kurda da ne. Di nava du heftan li Saqîz, Sanandac û Pavê qasî sed mîlîtanên kurdîna hatîna gulle kirîna. Bi sedan gundîyên kurdîna wekî 67 rûniştewanên gundê Qarnê (li ser rîya Naxade-Mahabad) hî destêna Pasdarêna Xomeynî hatîna kuştîna, serjê kirîna.

Dem xemgîn e. Lê şer dom dîke û şerekêna tevgera kurdîna Dr Qasimlû û Şêx Hûseynî carîndîna kirîna, ewê heta serfiraziyê

dôm bike. U gava ku xelkekî bi bawerî û ezm xwe bide şer, heke sefêna wî yekbûyî û serokatiya wî şoreşger be tu hêzekî li cîhanê nikare berxwedana wî bişkêne. Serfirazîya dawîna ya wî ye. Vietnam, Cezayîr, Nikaragua, Mozambîk, hwd. vê rastiya dîrokî tîmsal dîkin.

Di hoyêna (şertêna) dijwar de, di nav tehrîk û kuştîna de jî hêzêna Kurdêna Îranê di sêrê siyasî û îdeolojîk da kêmasî nekîrin. Ewan heta dawiyê xwe alîgirêna aşîtî û li hevhatîna, yêna azadî û demokrasîyê nîşan dan. Ev siyaseta han hêzêna demokratîk û pêşverûyêna Îranê (Cepha Neteweyîya Demokratîk, Fedayîna Xelq, Nucahidîna Xelq, gelek keriyêna Tûdehê), kes û hawîrêna demokratîk li dora wan civandîna, di cîhanê de jîbo doza

SERRESIM

- * Nasîna welatê kurda.....r. 4
- * Bi Kurtî Dîrok.....r. 7
- * Hêzêna siyasî yêna Kurdistanê.....r.10
- * Bihara azadiyê.....r.14
- * Piştgîriyê gelê kurdêna Îranê.....r.20
- * Xwestekêna gelê kurdîna.....r.22
- * Ewê şer dirêj dom ke, dibêje Dr Qasimlû.....r.24
- * Barzanîzma bê Barzanî(II).....r.28
- * Ber bi yekîtiya xwendekaran?.....r.30
- * Zman.....r.31
- * Stran û leylan.....r.32

DEMA ŞERÊ ÇEKDARÎ

kurdî dilxwaziyeke heta niha nedîtî da peydakirin. Iro ji bo herkesî yên êrîşkar, zordest û neheq karbidestên Iranî ne. Şerê Kurda yê jîbo demokrasîyê û jîbo mafên neteweyî şerekî "maqûl", rast û meşrû ye. Ev yek, gelek girîng e.

Şer nayerevîn bû; ewê rojekî biteqîya. U ew bi gotara Xomeynî ya 17ê tebaxê destpêkir. Ewê di 25ê tebaxê de li Mahabadê Kongra Celên Bîdestên Iranê bi beşdariya Ereba, Belûç, Tirkmen, Azerî, Lor û Kurdan bicivîya. Ev civîn ewê di siyaseta xurtkirina rêzên demokrasîyê û tecrîtkirina Xomeynîstan de gawekî mezin bûna. Dîsa wê heftê, ewê Dr Qasimlû, gotinbêjê bijartiyê Kurdistanê, li Meclisa Pîşporan bernama partiya xwe jîbo

şerekî dijwar

Iranêke demokratîk, laîk, komarî û federal bixwenda. Pêşverûtiya Iranê nikaribû dest bide tîştêkî awaha. Loma ew du sê rojan de 30 kovar û rojnamên "dijî - islamê" tevî PDKI qedexe dikir, merkezên Fedayîn, Mucahidîn û Cepha neteweyî ya Demokratîk dida îşxal kirin, dest bi şerê Kurdistanê dikir. Heweskarên diktatoriyeke tîr, a li ser navê islamê, hevalbendên Amerîkayê, hawirên ku ji demokrasîyê ditirsiyan navtêdaniya şer kirin. USA jîbo meşandina bombavêjan kerozen û bi ser da 4 milyar dollaran çek difirote Iranê.

Iro ji gelê kurdê Iranê jî şerkirinê pê ve riyekî tune ye. Ew mecbûr e hebûna xwe, xwestekên xwe yên xweserî û demokrasîyê bi çekan jî biparêze. Lê ew şer bi hindikî di meh - û he

ye ku salên - destpêkî de dijwar be, pîr dijwar be. Çend me - hên azadiyê têr ne kirin ji bo gihandina mîlîtanên siyasî, jîbo qenc teşkîlkirina bajarî û gundiyên Kurdistanê, bi kurtî ji bo têkûz kirina eniya hindurî. Hê di nav gelê me de perçebûnên mezhebî, eşîrî û siyasî hene û heye ku karbidestên Iranî dikaribin wan bikar bînin. Wextê kurt têr ne kir jîbo pêşveçûn û xurtbûna hêzên demokratîkên îranîyên din. Bi milyon gundiyên nezan, karkerên neserwext îro di bin tesîra taassub û mîstîka îslamî de dikarin xwe jîbo Xomeynî, jîbo "dîn û îmana xwe bidin kuştin.

Kurdên Iranê ji dinya derva bi hidûdên du dewletên dijî - Kurd tîr veqetandinê. Arîkariya derve "hîma ewle", ku ji her şerê gerîllayê re hewcedariyeke mezin e, ewê li wan kêmbê. Lê bi saya pêşdîtîniya serokatiya wan, ew ne bêtedarî in. Qet ne be ji alî çek û posatan da dikarin du salan bê alîkarî xwe biparêzin. Heta ku şerê wan çarekî siyasî bide qebûlkirinê.

Ji niha ve tîştêkî eşkere ye: şer çiqas dijwar bejî, çiqas dom ke jî ewê şerkarên azadiya Kurdistanê neyên perçiqandinê. Bawerî dikare çiyar bihejîne. Baweriya pêşmergan bi doza wan a rast, serokatiya wan a pêşverû ewê zû an dereng gelê Kurd bigihîne serfiraziyê. Bi hemî awayan arîkariya wan kirin, wezîfa şoresgerî ye ji bo hemî demokrat, pêşverû û sosyalîstên Kurdistanê. U ji bo demokrat û azadîxwazên cihanê!

BIJÎ ŞERÊ GELÊ KURD LI IRANÊ!

Ji çara yekê welatê kurdan di nav tixûbên (sînorên) dewleta Iranê de ye. Kurdîstana Iranê kevintirîn dergûşa gelê kurd e, warê Medên dîroka kevnare, cîgehê Rostemî Zal, Ferhad, Kawe û Mazdekê efsanewî ye. Aqara wê 125.000 km² ye (7,6% ê milîkê Iranê).

Navçeyên wê çibigire hemî çiya û navdeştên bilind in. Bilindahiya navînî jî riyê deryayê jî 1000 m. bêtir e. Çiya bi dehl û daristan in. Di 1975 an de ev daristan, bi pîranîyên mazîyê, nêzî çar milyon hektar cih di girtin (1).

Di wê salê bi xwe da li Iranê 5,5 milyon Kurd dijîn (16% ê gelhayê Iranê). Lê li Iranê xeynî Kurdan gelên ne-Farisên din jî hene. Û tewer ew jî sisiya duyê rûniştvanên vê dewletê pêk tînin. (Binhêre şema N°1).

Erdnasî

Di zmanê îdarî û xerîteyên resmî yên Iranê de jî bo kêmnîşandana hebûna gelê kurd tenê jî navçeya navendî (merkezî) ya Kurdîstana Iranê re "Kurdistan" tê gotin. Navçeya bakûr "Azerbeycana rojava" ye ya nîvro jî "Keremşah" e. Dervayî van her sê navçeyan hin neteweperstên kurd Loris-tan û welatê Baxtîyaran jî ji Kurdîstanê dihesibînin. Mî-

rê Bedlîsê û zaneyê kurdê navdar Şerêfxan jî di şerefnama xwe de dinivîse ku Lor û Bextîyar Kurd in. Lê îro, piştî cihêbûnîyên sedsalan, Lor û Bextîyar, her çiqas zman û edetên wan jî yên me ne pir dûr bin jî, xwe gelên (xelkên) cihê dizanin, loma em wan naxin nav hesabê Kurdên Iranê.

Li Kurdîstanê bi xwe dervayî Kurdan qasî 470 000 Azerî hene. Şahan, di siyaseta xwe ya perçekirin û berîhevdana gelên Iranê de, wan li ser erdên çêtirên Kurdîstanê bicihkirine û imtiyazên berbiçav dane wan ku ew jî sazûmana şahîtiyî biparêzin, li dijî tevgerên azadîxwazên gelê kurd derkevin, şerkin. Ev Azerî di pênc-şeş bajarên dora deryaçeya (gola) Wirmê (Urmiye) dijîn piraniya giran bajarî ne. Di bajarên Wirmê (Urmiye an "Rezaîye"), Miyanduab, Salmaz (Şapûr), Xoy û Maku yê de pîranîya rûniştewanan pêk tînin gava ku deşt û gundên dorhêlê seran ser kurd in. Bi vê

siyaseta şahanî bêtirî 400 000 Kurd jî li Xorasanê hatine bicihkirin. Şah Abas di sedsala 17an de wan jî bo parastina tixûbên Iranê li dijî eşîrên şerkarên Tirkmen Kurdîstanê şarederî (sîrgûn) biribû heta van pêplûkên Asya Navîn! Iro ew di bajarên xorasanîyên Qûçan û Dargaz da pîranî ne û jî zmanê xwe, jî awayê jiyan, edet û kevnesopîyên kurdî tişteki wînda ne kiri ne.

Bajarên sereke

Li Kurdîstan Iranê Faris jî hene. Lê hejmara wan, 235000, kême û ew wekî tîcîr an karbidestên îdarî, an leşkerî tenê di bajarên de dimînin.

Ji sedî heftê (70%) Kurdên Iranê, di sala 1975an de, li gundan, yên mayî (30%) di bajarên piçûk û mezin de dijîn. Bajarên sereke Keremşah (300000), Wirmê (Urmiye, 170000), Sîna (Sanandadj, 76000) Mahabad (Sablax, 42000) û Saqiz (26000) in. Banê, Xanê, Pîranşar, Marîvan, Serdeşt, Şîno (Uşnoviye) ku van demên dawîn navên xwe di çapa cih-

(1) Daneyên vê bendê jî pirtûka "Les Kurdes et le Kurdistan" Paris, 1978, hatine girtin.

KRONOLOJÎ

Piştî belavkirina axê ya salên 60, axa û xwedîmilkên mezin hatine li bajaran rûniştine. Sermayeyê xwe hin di ticaretê de hin jî di avakirina mal, xan û hotelan da bikartînin. Nûfûza wan a siyasî û çandî hêjî li ser xelkê heye.

Heçî gundî, 95% ê wan ciwarbûyî ne; koçerê temamî û "xwerû" qet nemane. Nîv-koçerên ku zivistanan li gundên germiyanan, havîna li zozanan dijîndora 160000ne. Nîvê gundiyan hê îro jî bêax in û wekî kargerên erdçîn (ziraî) ebûra xwe dikin. Xwedîgundên mezin, axa û begên ku berî dehsalan 60% erdên çinîne di destên wan dabûn îro nemane. Reforma Şah, erd û gundan jî wan stendîye li gundiyan navîn û piçûk belav kirîye û didewsê de diravekî (pereyekî) baş daye wan da ku ew li bajaran bibin hîmê geşbûniya kapîtalîzmê û yên sazûmana Şah.

Erdçînî û dewarxwedîkirin îro hêjî bi awayên destpêkî (iptidî) yên "bav û kalan" tînin kirin û hîmên aborîya Kurdistanê ne. Di sala 1975an da 80% hatinên Kurdistanê ji gundan (45% ji dewarxwedîkirinê, 35% ji erdçînîyê) dihat.

Eynî sal hatina salewextî ya serê kesî li Kurdistanê 150 dolar, li Iranê 1340 dolar bû. Ev hejmar, ji hemî gotaran çêtir, paşdemayîni û belengazîya ku gelê kurd tê de hatiye hiştinê, diyar dike.

10-11 sebat 1979: piştî salekî mesandî, sîn û kefteleft bermayeyên sazûmana xanedana Pahlewîyan li ber derbên şoreşa xelkê hildiweşin.

19-20 sebat: Yasir Arafat tê Iranê û li wir Dr Qasimlû jî dibîne. Ewî tevî delegasyoneke PDKI gazî Beyrûtê dike

20 sebat: Hikûmet di televîzyonê de bala xelkê dikişîne ser talûka perçekirina Iranê, Xumeynî perçiqandina "rêbirên kurd" dixwaze.

3 adar: PDKI li Mahabadê mîtingekî mezin çê dike û li ber 200 000 kesî eşkerebûna xwe îlan dike.

18-19 adar: Şerê Sanandacê.

28 adar: Delegasyoneke Kurdan diçe Qomê Xumeynî dibîne.

20-21-22 nîsan: Şerê Naxadê

3 tebax: Helbijartinên Meclisa Pîsporan. Ji du bijartiyên ne dîndaran yek Dr Qasimlû ye. Girtina rojnama pêşverû "Ayandegan". Gava pêşîn a ber birakirina azadiyên çapê û partiya.

17 tebax: Xumeynî di gotarekî gefdar da êrişî mezîna dijî maf û azadiyên demokratîk, dijî gelê kurd, dijî hêzên pêşverû û demokratîk dide destpêkirinê. Di nav 4 rojan de hemî rojnameyên "ne-îslamî" tînin girtin, meqerên Fedayî û Mucahîdîna wisa jî yê Cephaya Neteweyîya Demokratîk û Hizbî Tûdeh tînin îxalkirinê.

23-26 tebax: Şerê Saqizê û destpêka şerê Kurdistanê. Di şeva 25-26da pêşmerge bajêr vala dikin. Di nav heftekî da nêzî 100 kes bi destên mehke-mên îslamî tînin gullekirin. Di nav wan de doktorekî îranî û 9 zabitên îranîyên dijî şer hebûn. Piştî vê girtinê Kurd jî ji Pasdaran 200 kes digirin û 4 ji wan dikujin û dibêjin ji bo her Kurdê kuştî Pasdarekî dikujin.

3 îlon: Piştî ketina Mahabadê serê gerilla ya domdirêj destpêdike. Kurd tevî serekên xwe ve dikişin serê çiyayan. Ewê roja 14 îlonê radyo-televîzyona Mahabadê 2 saet îxalkin û tê de xeber didin.

4 an 5 îlon: Qirkirina gundiyan Qarnê. Piştî kuştina 30-40 Pasdaran di dafika pêşmergan de, Pasdar gundê Qarnê îxal dikin û 67 rûniştevanên wê, bi piranî kal, pîr, jin û zaro serjê dikin (binêre wêne ya r.19).

BI KURTÎ DÎROK

Perçebûna pêşîna Kurdistanê di sala 1514 de diqewime. Roja 23 tebaxa wê salê leşkerên Osmanî yê Siltan Selîm bi arîkariya hêzên mîr û begên kurdên sunnî li Çaldîranê (li rojavayê gola Urmiyê) ordiyên Şah Ismaîlê şîrî diperçiqînin. Şah Ismaîl dixwast tevahtiya welatê kurdan têxe nav milkê xwe, piştî şer jêre jî çarê yekê Kurdistanê dimîne.

Di şerê Sultan û Şahan de Kurd ciyekî xwediyê giringiya (ehemiyeta) stratejîk digirin. Welatê wan çiya-yên asê yê bê rê û dirbin. Zevt û çavnerîya wê dijwar e. Herdu alî jî dixwazin Kurdan ji xwe ne enîrînin da ku ew nebin hevalbendên dijminên wan. Siltan Selîm, bi devê Mela Idrîsê Bedlîsî, ku dîroknasê naxwastdar Joseph Von Hammer (1) yek ji 3 zaneyên mestirên

sedsala XVI qebûl dike, jî mîr, mîrek û begên kurdan re dide zannîn ku heta ew serî li ber Siltan ranekin ewê di ajotina karê xwe de bi serê xwe bin. Bi vî awayî li Kurdistanê "Osmanî" 16 mîranî an dewletokên kurd (Kürt Hükümetleri) saz dibin ku mezîntirên wan yê Bedlîs, Botan (Cizîr), Şemdînan (Hekkarî) û Soran (Rewandûz) bûn. Dervayî mîranîyan Bab-ul-Alî li Kurdistanê 52 sancaqên kurd (yên ku serokatiya wan jî bav derbasî kur dibê) rast dike lê bajarên sereke

(Diyarbakir, Mêrdîn, Sêrt, Erzurum) di bin destê xwe de dihêle. Ev rewşa han heta destpêka sedsala XIX an domdike.

Li Iranê jî Şah ji bo ku "Kurdên wî" ber bi Osmaniya ve neniherin û mebin hevalbendên wan, "mafên (heqên) Kurdan", hebûna mîraniyên serbixwe qebûl dike. Ji wan mîraniya Ardêlanê (li navçeya Sinna) heta sala 1865 a xweserîya xwe diparêze.

Carna, hin Şah jibo xurtkirina dewleta xwe mîraniyên kurd rakin, leşkerên xwe dişînin ser wan. Hingê gelê kurd, di bin serokatiya mîr û began li ber şahan serî hiltîne, şer dike, berxwe di de. Navdartirên wan berxwedanan ya Kela Dimdimê e. Di sala 1608 an de Şah Abbasê Şefewî leşkerên xwe dişîne ser Kurdên Dimdimê. Kurd di bin serokatiya Amîr Xan Bradost da bi mîrxasîyekî mezin şerdikin, berxwedana wan hê jî efsaneye

di nav gundiyên dorhêla Urmiyê (2). Piştî şikestina berxwedanê leşkerên serdar Qizilbaş bi deh hezaran Kurdan qir dikan.

Di sala 1639 an da piştî şerê Osmanî-Iranî Şah Abbas û Sultan Mûrad Peymana Qesrêşîrîn imza dikan. Tixûbên hingê kifşkirî kê-m-zêde yê îroyî ne. Kurdên Iranê di herkeys û fersendê li dijî zordestiya Isfahan (serbajara kevna Iranê) û Tehranê şerdikin. Serhilanîna şêx Ubeydullahê Nehrî di sala 1880 an de navçeyên kurdên nava golên Wanê û Urmiyê azad dike.

Şêx di tebaxa 1880 an de navçeyên kurdên nava golên Wanê û Urmiyê azad dike. Şêx di tebaxa 1880ê

(1) J. Von Hammer, 1' - Histoire de l'Empire Ottoman, Paris, t. IV, p. 222.

(2) Li ser şerê Dimdimê, binêre romana Erebb Şemo, Dimdim, Erîvan, 1966 (wergerandî-nên rûsî, çekî, hwd).



de li Şemdînan 220 se rekeşîr, şêx û mela yên kurd dicivîne û bi wan ra şêwra saz-kirina Kurdistanê yekbûyî û serbixwe dike. Şerê azadiya Kurdî da heta dawîya sala 1882a dikişîne, sirgûna Şêx Ubeydullah, hevalbendiya (tifaqa) Iran û Osmaniyan ewî di xwînê de difetisîne.

nêzî me, di sedsalaxa XIX a de, serxwebûnên xurttir yên Smaîl Axa Simko ne. Serê kê eşîra Şikakan, Simkoyê peymanê Sevrê û tevgera Şêx Mahmûd Berzencî li Kurdistanê Iraqê, serî hiltîne. Tevahiya navçeyên li rojava gola Urmiye ji sala 1920 heta 1925 di bin destê wî de ne û Simko doza serxwebûniya Kurdistanê dike. Di sala 1923an de diçe Silêmaniyê dîtina Şêx Mahmûd jibo girêdana tevgerên kurdên Iran û Iraqê. Simko ji alî leşkerî û şer da xurt e lê ji alî siyasî de tevgera wî qels e, bêserî, bê tenzîmeke siyasî ya modern, bê bername ye. Cêribandinên siyasî

û diplomatîkên serokan tune ne. Casûsên ingilîz Simko dixapînin pê serekê Sîryanîyên Wirmê Mar Şemûn didin kuştin. Yê Şah Riza (ku di sala 1925an bi arîkariya Ingilîza darbe kiribû û xwe Şah îlan kiribû) wî vedixwînin (dawet dikin) Şîno jibo "mizakereyên siyâsî" Roja 21ê hezîran 1930 generalên Şahên ku bi Simko re "mizakere" dikirin wî bi bêbextî dikujin. Tevgera bêserî mayî, wek ya Barzanî, dipelişe.

Salekî piştî kuştina Simko, Cafer Sultan li nîvroya Kurdistanê Iranê serî hiltîne. Lê ev serxwerabûn jî tê perçiqandin.

Berbiçavtirîn tevgerên azadixwazên kurdên Iranê, bêgûman Komara Mahabadê ye. Emê di wêbêyê de li ser dîroka wê ya rengîn û dewlemend dûr û dirêj binivîsin. Bi kurtî: Di 20ê tebax 1941an da leşkerên hevalbendan, sovyetî, ingilîz û amerîkanî dikevin Iranê. Hikûmeteka qels li Tehranê şûna Reza Şah digire. Ingilîz û Amerîkanî nîvro ya Iranê, leşkerê sor jî bakûrê îşxal dikin. Partiyên siyasîyên heta hindê veşarî, gelên bindest ji vê wê lahiya siyasî istîfâ de dikin.

Perçekî welatê kurda dervayî îşxala hevalbende ye. Mahabad di navenda (merkeza) vê navçeya Azad da ye. Di 1942an de li wir Komala Jiyanî Kurdistan rojê dibî-

ne û di nav xwendî û bajarîyan da zû pêşve diçe. Ev pêşveçûn hewcedariya şazkirina partiyeke mezin û demokratîk dide peyda kirin jibo civandî nabajarî û gundiyan Kurdistanê. Di tebaxa 1945an de PDK a Iranê tê danîn. Roja 22 çile 1946an, di civîneke mezin de, Qazî Mihemed, sermiyanê PD KI, li ber gelê Mahabadê û şandîyên hemî navçeyên kurdên li bakurê Saqizê, Komara Kurdistanê îlan dike. Hikûmeteke 13 endam saz dibe. Qazî dibe serrek Komar.

komara mahabadê

Ev Komar ji salekî kêmtir dijî lê gelek ji daxwazên salaneyên gelê kurd bi cih tîne. Zmanê kurdî dibe zmanê resmî yê îdare û xwendegahan. Rojname û kovarên kurdî dertên. Di nav wan de Kurdistan (organa PDKI); Halala (Lale), kovara jinan; Cûgalî Mindalan, jibo zaroyan. Tiyatroyeke kurdî tê rastkirin. Peywendîyên ticarîyên bi Sovyetistanê re jiyana aborî geş dike. Mal û gundên malxweyên "caş" li gundiyan û li Barzanîyan tînen belav kirin. Di şûna leşker û polîsê Şah da Pêşmerga tê saz kirin û Mustafa Barzanî, bi rutba general, dibe serokê pêşmergan. Di kanûnê de, leşkerên Iranî bi arîkariya Ingilîz û Amerîkanîyan pêşiyê Komara Demokratîk Azerbeycanê, dûre ya Kurdistanê diperçiqînin. Li Azer-



Qazî Mihemed

beycanê bi hezaran demokrat tên kuştin. 22 sebat 1947, piştî mizakere û peyivdariyên bi Şahê Iranê re Barzanî xwe ber bi Iraqê firehdikşînin û di wê navê de şerê leşkerên Iranê dikin gelek ji wan dikujin an dîl digirin.

30 adar 1947: Qazî Mihemed, brayê wî Sadr Qazî û pismamê wî Seyf Qazî li Mahabadê li meydana Çar Çira tên bidardakirinê. Di roj û hefteyên pişt de di bajarên Kurdistanê yên din de şerkarên kurd ên sereke tên girtin û kuştin.

Gelê kurd rojên azadî û bextewariyê yên dema Komara Kurdistanê hêjî bi bîr tîne. Şeş sal piştî ketina Komarê, di hejîbijartinên 1952an de namzêtên PDKI di nav 80% û 99% dangan distînin. Lê Tehran helbijartinan betal dike. Di wê salê de gundiyên navçeya Bokan û Mahabadê, di bin serokatiya PDKI de serî hiltînin, lê biser nakevin. Di referenduma 3 tebax 1953an de gelê kurd çibigre bi

temamî li dijî Şah jibo Dr Nosaddeq deng dide. Li Mahabadê ji 5000 dangan tene 2 jibo Şah in.

Dr Nosaddeq dixwast nefta Iranê ji talana şirketên inglîz û amerîkanî xelas ke. Gelên Iranê, wekî gelê kurd, piştawî digirtin. Lê ev li hesabê emperyalîzma talanker ne dihat. Roja 19 tebax 1953 a, CIA amerîkanî darbekî leşkerî dike li Tehranê. Şahê ku reviyabû Romayê vedigere ser text. Girtin û kuştina pêşverûyan destpêdike; û talana dewlemendiyên Iranê ji berê xurttir dom dike.

gerilla gundiyan

Şerê çekdarê da wîn yê salên 1967-1968 bûn. Ew di zivistan 1967an li navçeya Mahabad-Serdeşt-Banê di bin serokatiya "Komîta şoresger" a PDKI destpêkir û 18 meh di nav bêdengî, tecrîtî, û tunebûnê de dom kir. Piştî kuştina serokên wî Şerîf Zade, Abdullah Mûnî û Mela Aware, ev "gerilla gundiyan" jî berebere qels bû û şikest.

Ev şerên mîrxasî bi tenê nikaribûn ji heqê sazûmana xwîn -

Gelê kurd di ho-yên dijwarên zordestîya Şah da jî şerê xwe yê azadîxwaz di-de ajotin. Bi sedan şerkarên kurd tên kuştin an girtin. Hin ji wan wekî Azîz Yûsefî û Xênî Bilûryan ewê 25 sal di zindanên Şahê zorkar da bimînin. Di destpêka 1956an de Kurdên Ciwanro serî li ber zordestîya sazûmana Şah radikin. Serxwera bûna wan ewê bi tevkariya leşkerên Iran û Iraqê bê perçiqandin. Piştî şerekî dirêj û mîrxasane kela Ciwanroyê, sembola azadiyê Kurdan, dikeve,

rêj û zorkara Şah bi hatana der. Lê her yek ji wan darbekî li hîmên vê kela zordestiyê xist, her yek ji wan gora şahîtiyê kola, her yek ji wan arîkariya hişyarbûn û têgihîştina siyasî ya gelê kurd kir. Hişyarbûna neteweyî, yekîtiya siyasî ya Kurdên Iran rehên xwe ji van şerên siyasî, îdeolojîk û çekdarîyên salan dikşînin. Meyweyên têkoşînê ne, ne yê mucîzê. Di dîrokê de mucîze tune ye.

★KURDISTANA IRAQÊ: PARTIYEKE NÛ★

Li gora Nûçeyên ku ji kanîyên agahdar gihîstine me di meha tebaxê de "Bizûtnewey Sosyâlîstî Kurdistan" a Resûl Mamand û "Komîta Amadekirina PDK Iraqê" ya Dr Mahmûd tevî hin kes û komikên gihîstine hev, bi hev re partiyeke nû danîne. Navê vê partiyê Partiya Sosyâlîsta Yekbûyî ya Kurdistanê ye û ew ji niha ve xwediyê 2500 pêşmergan e. (Hêza leşkerî ya diduya, piştî "Qiyadê") "Bizûtneweya" a Resûl Mamand di destpêka salê ji "keysperestên Yekîtiya Nîstîmanî" ya Talabani qetiyabû.

HÊZÊN SIYASÎ YÊN

Piştî qelibandina sazûmana Şah, li Kurdistanê qasî 15 komele, kom û komikên siyasî peyda bûn. Hin ji wan şaxên hêzên siyasî yên Irant (Fedayî, Tûdeh, Zehmetkêş) ne; hinên din, komikên piçûkên cîgehî (mahallî) ne, ku carna hejmara endamên wan ji 15-20ê na bihure.

Li dervayî van komikên xwendekar û burjûwayên piçûk hêza siyasî ya sereke, ya ku him li gundan û him li bajaran piraniya fireh a gelê Kurdistanê li dora xwe dicivîne, bêgûman, PDKI ye. Di benda jêrîn da em çend agahdariyên kurt li ser van hêzan pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.

PDK A ÎRANÊ

"Partiya Qazî Mihemed", PDKI, piştî 34 salên şerê siyasî û îdeolojîk îro mezintirîn partiya siyasî ya ne-dînî ya tevahî ya Iranê ye. Boykota giştî ya referenduma li ser "Komara Islami", helbijartina Dr Qasimlû wekî nemînen deyê Kurdistanê jibo Neclisa Pisporan xurtahiya vê partiyê bi awakî zelal diyar kirin. Hê di mîtînga xwe ya eşkereya pêşîna 3ê adarê, PDKI 200-000 kesên ji çar aliyên Kurdistana Iranê hatî li bajarê Mahabadê civandibû û ev qewimandin bala nêrevanên hindur û biya-

nî(ecnebî) kişandibû (1). Bûyerên heftêndawîn rola wî ya pêşajo û berhevkerê hêzên demokratîkên Iranê nîşan dan.

Xêza siyasiya demokratîk, pêşverû, berhevker a PDKI di pratîka îdara piraniya bajar û navçeyên Kurdistanê de karker, cotkar, têcirên piçûk û xwendiyên kurd li dora wê civand. Ji gundiyên bêaxên bi saya partiyê çekdarbûyî heta mamoste û melayên demokrat piraniya gelê kurd xwe di vê xêza ji sektarîzmê, ji nexweşiyê xortaniyê dûr de dinasin.

ne Kurd bûna qebûl nedikir. Hoyên hindur û derva jibo êrîşa hêzên pêşverû dest dîba. Leşkerên sor li Wirmê bûn yên Ingilîz û Amerikanî jî navçeyên jêrî fêçizê işxal dikirin. Di navçeyên mayîn de (Mahabad, Banê, Bûkan, Naxade, hwd) valahiyeke siyasî hebû û diviya bû ku Kurd wê bikar bînin. Ji vê bûne, cihayekî siyasîyê fireh, xwediyê bername û bidehhezaran endaman hewce bû. Loma di tebaxê partîyeke nû bi navê "Hizbî Demokratî Kurdistan" hate danîn di bin serokatiya Qazî Mihemed û bi ketina hemî endamên komala û gelek kes û hawirên welatpêrêzên din.

Partiya nû bi leşkerê sor û bi demok-

(1) *Binhêre rojnama fransîz a navdar "Le Monde" a 5.3.1979.*

(2) *Binhêre benda Archie Roosevelt Jr., "La République Kurde de Mahabad" di "Les Kurdes et le Kurdistan", Paris, 1978.*

Partiya Qazî Mihemed

PDKI di tebaxa 1945an da saz bû. Berî danîna wê xwendî û bîrewerên Kurd di îlona 1942an de Komala Jiyanî Kurdistan rastkiribûn. Komala di demekî kin da xebatkarên bajarî gundan berbixwe kişandibû, lê ew bêdestûr, bêbernameyeke siyasî ya ronak, bê

awahîyeke siyasî ya nûjen (modern) bû. Veşarî dixebitî û şaxên wê ne tenê li Iranê lê li Iraqê, li Mûsil, Kerkûk, Erbil, Silêmaniye, Rewandûz û Şeqlawa û heta li Tirkîyê jî vebûbûn (2). Komala, xerû neteweparêz bû û endametiya yên ku him dê him jî bavê wan

KURDISTANÊ

ratên Azerbaycanê ve girêdanên xwe çê dike û roja 22.1. 1946 an "Dewleta Cumhûriya Kurdistanê" li Mahabadê îlan dike. Sermiyanê PDKI, Qazî Mihemed dibe serekê vê komara ku ewê 11 meh bijî, û rûpelekî nû veke di dîroka şerên azadîxwazên gelê kurd da.

PDKI vê Komara şîna Kurdistanê danî bû û werîsê wê ye. Ev, yek ji kaniyên xurtahiya wê ya nav "xelkê nexwendî" ye. Pir kes hê Qazî Mihemed wekî "welî" dizanin û dihebînin(3), **XXXXXXXXXX**

xebata wî ya jibo gelê Kurdistanê ji bîr nakin û dixwazin ew bixwe û zaroyên wan li ser "riya wî ya pîroz" bimeşin, jibo partiya wî bixebitînin.

Ji ketina Komara Mahabadê bi şûn da salên dirêjên şerê veşarî, yên kuştan, zîndan û şarederî

Ji ketina Komara Mahabadê bi şûn da salên dirêjên şerê veşarî, yên kuştin, zîndan û şarederî destpêkirin jibo mîlîtanên PDKIyê. Piştî bi dar da kirina Qazî Mihemed û du wezî

(3) *Nêzîktî sêsed sal piştî mirîna wî, gora zaneyê kurdê navdar Ehmedê Xant jî tro li Kurdistanê Tirkiyê tê "hebandinê". Ji bo Kurdên navçeya Agirt, Xant "weliyê Xwedê" bû!*



rên wî di berbangas 30 adar 1947an, bi sedan endamên PDKI hatin

girtin û gelek ji wan hatin kuştin. Lê gelê kurd li pişt wan bû. Ewê di helbijartinên 1952 an de "Partiya Qazî" ji sedî 80 heta 99ên dengên bistîne li navçe yên kurd û dîsa wê salê ji serhilanîna gundiyan Bokaanê re serokatî bike.

Piştî derbeya CIA ya 19tebax 1953a, û vegera Şah, zordestiya sazûmana Tehranê hê diwartir dibe, bi hezaran demokrat têtin girtin. Di nav wan de bi sedan endamên PDKI hene û ewê du ji

wan Azîz Yûsefî û Yennî Bilûryan 25 sal di zîndanên Şah da bimînin. Yên ku li **dezza**

derva ne, ji 1961 an bi şûn da di ber şerê siyasî de, bi arîkariya tevgera Kurdên Iraqê bilî ne. Lê di 1966an de Barzanî peywendiyên xwe û Şah xweş dike û arîkariyê rasterast distîne, ji Kurdên Iranê "cemidandina şerê dijî Şah" dixwaze. Hin ji wan serî ditewînin li ber fermana Serok hinên din vedigerin Iranê "Gerîlla Gundîyan" ya 1967-1968 an didin destpêkirin û 18 meh şer dîkin. Ewê ji wan, Abdullah Mûî-



MAMOSTA HUSEYNÎ : HER TIŞT JIBO AZADIYA GELE KURD

nî, Şerîf Zade û Mela Aware di qada şer de bikevin û Silêman Mûînî tevî 40 endamên PDKI bi destên pêş-mergên Barzanî bên girtin û teslîmê Iranê kirin.

Piştî lihevhatina Kurdî-Iraqî ya li adar 1970ê peywendiyên PDK yên Iran û Iraqê piçek çêtir dibin. Partiya Iranê bi ketina gelek endamên demokrat û pêşveruyên nû ji xêza "barzanîst" difilite, rûçikekî nû antî-emperlîst, antî-feodal, pêşverû dide xwe. Di hezîran 1971an de Konferansa IIIa Komîta Nawendî (Merkezî) ya nû dibijêre, destûr û bernameya nû hazir dike. Ewê Kongra IV a ku di îlona 1973 an

da bi beşdariya 49no nerên ji hindur û dervahatî dicive, vê xêza pêşverû bipejirîne (tesdîq bike) û hilmekî nû bide şerê siyasî û îdeolojîk ê jibo "welgerandina sazûmana dîktatoriya alîgirê emperyalîzmê, danîna hikûmetekî demokratîk a ku azadiyên hemî gelên Iranê, mafên wan ên otonomiyê di nav çarçeva Iranê de binase". Dostên me, dibêje bernameya nû, hemî demokrat in, parêzkarên mafên mirovî ne, tevgerên rizgarîxwaz û wela-tên rizgarîkiriyên cihana 3a ne. Welatên sosyalîst û ramana tevane ya pêşverû ya cihanê ye.

Berî qelibandina sazûmana Şah, li Kur-

distanê dervayî PDKI hêzeke siyasî ya kurdî an îranî tune bû. Gelê kurd ne di bin serokatiya Ayatollahan lê bi rehberiya partiya xwe şer kir. Şîara PDKI "Xudmextarî bo Kurdan, demokrasî bo Iran" berebere bû ya hemî hêzên siyasîyên Kurdistanê.

Navdartirên serekên PDKI, Dr Abdulrahman Qasimlû û Xênî Bilûryan in. A. Qasimlû doktorê aborî (ekonomî) ye û bi salan li Zanîngeha Pragê (Çekoslovakya) ders daye. Li ser dîrok û aboriya Kurdistanê pirtûk û bendan nivîsiye û nivîsarên wî li çend zimanên biyanî derketine.

Fedayîne xelq

Di hêzên Iranî yên pêşverû da yên ku li Kurdistanê xwediyê hebûneke berbiçayîna, Fedayîne - Xelq in. Alîgirên wan xasme di nav keç û xortên xwendî yên bajarên mezin de hene (Sanandac, Kermansah, Wirmê).

"Çirîkê Fedayî" hê di sazûna xwe da, di sala 1971an de, mafên gelên bindestên otonomiyê qebûl kiribû û ji şoreşgerên Kurd dixwast ku ew berî

hemîyan enerjîya xwe bidin şerê rizgariya neteweyîya gelê kurd û bi vî awayî arîkariya rizgariya gelên Iranê bikin.

Fedayî di dema Şah de tevî Mucahîdên Xelq ve heşt salan şerê çekdarî kiribûn û bi dehan ji wan di vî şerî de ketin. Di rojên şoreşgerên 10-11 sebatê da darbeyên dawîn wan daweşand sazûmana Şah û di qelibandina

wê da rolekî mezin leyistin. Ew xwe "marksîstên serbixwe" di hesibînin. Ideolojî û pratîka wan a şoreşger ji wan ra di tevahiya Iranê de, li nav xwendekar û sendîkayên karkerên nef tê de gelek alîgir û dilxwazan dane peyda kirin. Li gora hin nêrevanan di tevahiya Iranê de qasî 15 000 şerkarên wan ên çekdar û 150-200 hezar dilxwazên wan hene.

Hizbê Tûdeh

Partiya Kommunist a resmîya Iranê, Tûdeh di sala 1941 an de sazûye. Ew di salên piştî şerê Cihanê II û heta 1953 an xurttirîn partiya Iranê bû. Lê xeletiyên bêhesab û giranên serokatiya wê di dema Mosaddeq de û stema Şah wê gelek qels kiribûn.

Tûdeh li ser pirsên neteweyî heta îro hê tevgereke zelal ne girtîye û di bernama xwe ya 1975 an de tenê du paragraf cih dide vê pirsê ku 2/3ên gelên Iranê eleqedar dike! Ew xwe parêzkarê "tevahiya erdê Iranê" û "çanda dewlemenda Iranî" (ya rastî farisî) nîşan dide lê ji hikûmeta Iranî nasîna "mafên neteweyî, civakî û çandî yên hindikahi-yên neteweyiyên Iranê" dixwaze.

Xurtahiya Tûdehê qenc nayê zanîn. Nêrevan alîgiriya wê ya "Komara Islamî" bi qelsahiya wê ve girêdidin.

Zehmetkêş

Komela Zehmetkêşên Şoreşger, li çibîgîrê hemî bajarên Kurdistanê şaxên xwe danîye û tê de ne "zehmetkêş" (xebatkar) lê hin xort û xwendekarên sêwiyên Maoîzmê hene. Çend sed kes in, Komala komikeke siya siya Iranî ye, tenê kurd nîn e. Her wekî maoîzmê îro li Iranê jî hetikiye û xelkê

dide revandin, "zehmetkêş" êşkere doza maoîzmê nakin lê xwe alîgirên Enwer Xocanîşan didin! Jibo wan "sosyalîzma rastî" ya "Rehber Enwer" e. Ku rehberê proletaryayê Enwer Xoca be, wêbê (musteqbel) bê hêvî ye. Hûn meteloka kurdî dizanin: "Malxweyê me Òm e, xwelî li serê me kom e!"

Lê Talabanî?

Hin hawirên talabanîst didin bêlav kirin ku ew li Iranê xurt in, ku şoreşê ew dimeşînin, xelk bi wan re ye, PDKI tenê li Mahabadê heye, hwd

Nêrevan û rojnamevanên bêaliyên ku çûne Kurdistanê û tiştan bi çavên xwe dîtine bi vê propagandaya derewî dikenin. Ku dermanê keçel hebûna ewê pêşî di serê xwe da. Ku hêza Talabanî hebûna ewê li dijî faşîzma Iraqê şer kirin. Iro tevî 300-400

pêşmergekên dawîn ên hê ku li dora wî mane ew li gundekî Iranê rûniştîye û xeynî gotarên vala, "siyaseta navnetewî", dan û stanên derva tiştêkî nake. Jibo wan siyaset derew e û di vê riyê de ew rastî siyasetzanên bê hempa ne.

Şîretekî: sibêro ku Eskîmo li Gronlandê şoreş kirin, li hêviya rojname û "Spark" nemînin. Ji niha da zanibin ku tiliya "Mam Celal" tê heye!

Jî NÛÇEGIHANÊN ME YÊN bihara

Pîştî ketîna Şah û ya qîşlê ku peşmergên PDKI zevtkirin, Mahabad di nav azadiyêke temamî jîya, bê polîsê resmî, bê leşkerê dewlettî. Komîtektî şoreştî, jî mîlîtanên siyasî pêkhattî, karên bajêr dimeştîne û xuya ye ku qenc jî heqê wan tê der. Pareka mezin a xelkê çekdar e lê kuştin jî berê kêmtir bûne û bazirganî, ku qaçaxîya çekan, ya radyoyan, ya çixaran gir dîke, di vê bihara 1979an da geşbûnektî nû dinase.(*)

Jibo cihêbûniya xwe ya nete weyî û dînî çêtir eşkere kin gelê kurd (bi piraniya xwe ya giran sunnî) Melayekî Mahabadê, ku bi baweriyên xwe yê welatparêzî û zanîna xwe ya fîreh tê naskirin, dane pêş. Li Kurdistanê, alîgirên wî wekî berê jê re Mamosta dibêjin lê li ber Faris û Azerîyan paya Ayatullah didinê jibo xwe qenc jî bawermendên Xumeynî, ku niha bûye Imam, veqetînin.

Mamosta Huseynî

Mamosta Huseynî zaneyekî îslamî ye. Bejn bilind, zirav, şêst salî lê lîserxwe ye. Weka mirovdînen din rûyekî wî yê dirêjê ku ber bisipîbûnê diçe heye û şaşîkekî sipî dide serê xwe. Li pişt camên stûrên berçavkên wî nêrîna baladar a jîrikekî dibiriqe. Rûçikê wî, kubar û esîl, tejî qencîxwazî dixuye. Janeke muzmîna gewriyê wî mecbûrî bi dengê zirav, terikî, qîsekîrinê dikê û carna bihîstina wî dijwar e. Lê belê, kengî ev deng di mîkroyên Mahabadê tê bihîstin xelk baladar û bêdeng dibe jibo dengê wî di hêwirza xwe de nenixêmin. Kurdistan heçî xetîbekî na, yê nîşane kî ye. "Ez pêşî Kurd, dûra misîlman im" dibêje Mamosta Huseynî gava ku pîrs jê tê kirin.

Berî hemîyan, dixwaze bi-be yekkirê mezin ê ku dikaribe hemî çîn û qorên civakiyên xelkê di nav yek hîlmekî welatparêzî de bicivîne. Ew bêgûman bi xêza siyasî ya PDKI re ye û bi bixwe xwe alîgirê "sosyalîzmeke maqûl" pêşkêş dîke. Pirtûkên Marx û Engels di kitêbxana wî da xwedî cih in, lê ew na be spartekê (delîlê) marksîstiya wî, wekî hin rojname nîvîsîn. Ew berî hemîyan bi felsefa îslamî hatiye xwedî kirin û melayekî pêşverû ye ku jî şoreşê bêtir reformê dixwaze. Lê jibo bidestxistina xweseriya (otonomiya) Kurdistanê di çarçeva Iranê da şerkîrinê bêdudilî, wa'z dîde.

VEŞEZA

mizovê çekdar

Li pişt vî mirovdînen rûsipî bejna kesekî din dixuye ku wî dide pêş û jibo bi xwe neyê nasîne xwe vedîşê-

(* Nûçegihanên me di meha nîsa nê de çûbûn Kurdistana Iranê û ev benda han di gulanê de hatîye nivîstin, belgeyektî li ser bihara azadiyê li Kurdistanê. Em êro wê bêguhêrtin derdixin.

ARIZÎ LI KURDISTANA IRANÊ azadiyê



MEŞANDÎN LI MAHABADÊ (17 MÎSAN 1979)

re. Ev mirovê esrarengîz, mirovê çekdar, mîlîtanê siyasî yê çeknasê xebata veşarî û binerdî ye. Piştî salên dirêjên sirgûnê li Ewropa ew çend meh berî ketina Şah bi dizî veşariya welatê xwe ji bo giyanekê nû bide tevgera xweserîxwaza (otonomîsta) kurdî, ku piştî 1947an bi rengê kî bêgîdî hatibû perçiqandî nê. Ev mirovê veşarî, ku ev qas xweş dizane xwe bide paş, jibo xebateke çêtir, Dr Abdul-Rahman Qasimlû, sekretêrê giştîyê PDKI ye. Ew bi xurtî arîkarî dide Mamosta Huseynî jibo bicihanîna rola wî ya berhevkerê xelkê lê bixwe ji temasên vekirî xwe dide alî. Ew li mîting û

meşandinan da nayê dîtin lê belê yê ku, di bin dest da, hemî pêşdît, hemî kir pergal û tertîbê ew e. Tevî çengekî hevalên xwe yê gihîştî, wekî Xenî Bilûryan ku 25 salan di zîndanên Şah da derbaskiriye ew bêwestiyan jiyanekî nû di dîna PDKI ya ku wekî Fenîksê ji nû ve ji axê dizê, bejn di de.

Di mehên dawîn da, bi hezaran gundî ji her aliyan tî daxwaza endametiye di - kin, lê kadroyên siyasî kêm in jibo gihandina van namzê dên, pirîcar ji binî nexwendewar, û serwestiya siyasîya hîmê hê sist e. PDKI ew wext, gelek wext e jibo gihandina mîlîtanên hêja. Lê wext



PASDAR: S.S. ÊN XWÎNRÊJÊN XOMEYNÎ LI BAJARÊ NAXADÊ (22 NÎSAN 1979)

bi destê wî nakeve, ew hê di meha nîsanê de mecbûrî lîdî jî hêzên hikûmetê şerkirinê bû.

Û ne tenê li dijî wan, wi sa jî li dijî şîlyên fanatî kên çend bajarên Kurdistanê ku xwedî hindikahiyên Azerî ne, Urmiya, Mîyanduab, Naxadê.

Li Urmîyê qîşlên ordiyê, bi piraniya xwe jî leşkerên Azerî pêkhatî, ne hatine sitendin di serhilanîna xelkê da. Leşker ber bi xelkê çû û hemî bi hev ra portreyên Xumeynî hilkişandin. Ji hingê ve, aqûbeteke dildarî leşker û Pasdarên xumeynîst digihî ne hev. Di bajarên din ên Kurdistanê, rûniştevanên kî-janan hevnejatir (homojentir) in, karbidestên dewletê siyaseta timzîndîya "perçe ke û îdare ke" diajon.

Di dema ketina Şah da, meylayê şîî Saftarî, ku tenê ji sê salan ve li Sanandacê dijî û ku PDK û partiyên çep endamekî kevnê SAVAKê dizanin Komîteki Xumeynî danî bû. Hejmara alîgirên wî pir kêmbû lê ev jibo nîşandana hebûna xumeynîst di vê kela kurdî de tê dîkir. Cava ku Ayatullah hikûmeta xwe danî, hevsarên Iranê xistê destên xwe û sazûmana xwe cîwarkir, ewî vî dîndarê heta wê rojê nenas perû kir, çavneîriya qîşlê spartê. Bê qîşlê, ewê tucar Saftarî û komîta wî ya leyîş tokî nikaribûna xwe li ser sahna siyasî ya bajarê kurd bigirtina û zû bihatina pa-qijkirinê.

Dîndarekî dinê Sanandacê, îcar kurd û sunnî, bi arîkariya diravên (pereyên) giran jî

nav qorên kevnepereştirên
 xelkê ji xwe ra alîgiran pey
 da kiribû û li dijî pêşverû-
 yan, xame PDKI, seferêke tûj
 vekiribû, çekên zengariyên an
 tîkommunîzma destpêkî bikar
 tanî. Xwezayane, nava mela yê
 şîî Saftarî û Muftîzade ne
 ew qas xweş bû, her yek çav
 lê bû. bibe temsîlkarê sereke
 yê hikûmetê. Lê di leyistikên
 siyasî da, rewşên awaha pîrî-
 car tên dîtin; karîn (iktîdar)
 tucar hemî kevirên (pîyonên)
 xwe di derbekî de nade pêş.

Sanandac

Pevçûna pêşîn abiharê.

Saeta Muftîzade hê nehata
 bû: di vê serê adarê da, dorâ
 destpêkirinê ya Saftarê bû.
 Rewşa ordiyê li Sanandacê na
 zik bû. Heta hingê, kesî êrîşê
 wê ne kiribû lê, her gav, êrî-
 şeke dikaribû biqewimiya. Hiş
 yarbûna nişkevayî ya welatpa
 rêziya kurdî bajêr dikeland.
 Neşandin, daxuyanwerî, mîtîng
 roj piştî rojê li dû hev di-
 hatin. PDKI sihetî kiribû, ku
 wekî Mahabadê, bi zabîr û leş-
 kerên kurd re peywendî girê-
 de. Lê serokatiya leşkerî, car
 kî devşewitî, ne xapiya bû û
 hemî kesên şikdarên ku dika-
 ribûn bibin hevalbendên Kur-
 dan girtibû. Ji tirsê muhase-
 reke dirêj ewî biryara ber-
 hev kirina stokên xwarinê da-
 bû. Mela Saftarî ji destdanî-
 na li ser kewarên genimê Sa-
 nandacê çêtir tişteki ne dî-
 bû. Lê xelk, ku ji xwe ji ordî
 yê ne razî bû, amade nîn bû
 ku xwe ji bo wê bê nan bihê-
 le. Ew daket kuçan û neqaîli-
 ya xwe nîşan da. Delegasyone-
 ke ber bi Komîta Xumeynî çû
 ji bo biryara xelkê ji Safta-
 rî re bide zanîn. Notirvanên
 çekdar agir kirin ser xelkê.
 Bajarîyekî hate kuştin. Ji şa-
 şiyê her kes di ciyê xwe da
 şemirî, bû kevir. Paşê kelekî
 mezin pêl bi pêl ji nav xel-
 kê rabû.

- Bimrin! Bimrin Savakî! Bim-
 rin bêbext! Herne ser xulamê
 kên Şah!

Qîrîn û hawar hildibûn ji vê
 derya mirovî ya ku bikelûbîn
 ber bi qişleyên ordiyê diki-
 şiya. Pêşmergekên PDKê kirin me-
 şa wan rawestînin, yê ku se-
 rî dikişandin bihişînin. Lê
 lehiya mirovî di nav pêl û
 hêwirza xwe da wan jî da ber
 xwe. Li jor, li serê girê ku
 lê ordî cîwar e, zabîr ferman-
 nan diorîyan û bilzêbez mît-
 ralyoz li çar aliyên qişlê
 dihatin rastkirin



PÊŞMERGEKÎ KURD DI ŞERÊ NAXADÊ DE

Leşker hiştin ku ev pêlên
 mirovî nêzî derbên wan bibin.
 Agir!

Di gavekî de bi sedan mirov
 ketin. Xelk bi her aliyan da be-
 lav bû. Pêşmerge bi kalaşnîko-
 vên xwe bersiv dan. Leşker ji
 xelkê sêsed rehîn girtin. Ji ba-
 jêr mîlîtanên PDKI û yê hêzên
 pêşverû bezîyan arîkariyê.

Ji Mahabad, Banê, Bûkan, Sa-
 qiz û Serdeştê bi kamyonan pêş-
 mergekê şerker ketin ser riyên
 Sanandacê. 18 û 19 adarê, şerekê
 har û gurr çêbû. Ordî hemî hêza
 xwe bikar anî. Tankên wê, çekên
 wê yê giran, helîkopterên wê
 taxên xelkê dan ber bomban, lê
 çembera Kurdan dorê lê digirt.
 Heke pê bida erdê, ewê PDKI di
 karibûna qişlê bistîne.

Lê, kar bê hesab dûr çûbû. Ce-
lek hêwirze û helahela çêkiri-
bû û hikûmet têkil bû. Kurd jî
şerekî giştî û ji nû ve qedexê
bûnê ne dixwastin. Şer bi lihev
hatineke agirbirîyê qediya. Bi
şertê ku leşker ji qışla xwe
dernekevin Kurd vegeriyan ba-
jêr.

Di vî şerê bêhazirî de 400
kes hatine kuştin, bi piranî
jin û zaro. Di vê navê de Mela
Saftarî, bi dizîka wînda bûbû.

Di helbijartinên jibo şûraya
şoreşî ya bajarê Sanandacê, hi-
kûmat arîkariyeke mezin da me-
rivê xwe Muftizade û yê ha pa-
rek jê li "feqîr û fiqaran"
belav kir. Lê çavê xelkê vebû-
bû, dem guhribû. Lîsta hev-
rayî ya Eniya hêzên Demokrat
(PDKI, Fedayîn, Tudeh, hwd...) 8
ji 11 endametiyan karkir. Di
nav wan de 2 jin jî hatin bi-
jartin ku ew di Irana Xumeynî
da, bi serê xwe şoreşek e.

Şerê Naxadê

Naxadê bajarokekî piçûkê
serhedê nêzî Iraqê ye. Ew bi
fira çivikê ji Mahabadê 25 km,
bi rê 70 km dûr e û xelkê wî
têkel e, Kurd û Tirk in. Piştî
ketina Şah, Mela Hesenî, serekê
dînî yê Tirkên Wirmê û merivê
Xumeynî, gelek merivên çekdar
şandibû Naxadê jibo li wêderê
komiteyekî Xumeynî rastkin û
li Tirkên (Qarapapax) bajêr
çek dabû belav kirin.

PDKI jî dixwast Kurdên Naxa-
dê ji alî siyasî de bicivîne û
biryara danîna şaxekî xwe da-
bû. Roja 20ê nîsanê mitîngeke
mezin Kurdên bajêr û yên ji
gundên dorhêlê hatî li ser çê-
reyên stadyûma Naxadê dicivand
Dr Qasimlû tevî çend endamên
serokatiya PDKI hatibûn jibo
axaftinê (qisse kirinê). Mitîng
hê nû destpêkiribû û peyîvkar
mesajeke Namosta Huseynî di-
xwend. Ji nişkeve bû şirqîna
tifingan. Ji xaniyekî tirkê
nêzikahiyê agir vedikirin ser
mitîngvanan. Peşmerge bersîva
wan dan û ji pacên mala tirk
gulle û destebombe barîyan

ser xelkê. Şerê Naxadê dest-
pêkiribû.

Serokên kurd xwe avêtin ma-
la Mela Salih, serokê Kurdên
bajêr û xwastin bi telefonê
ji Mahabad û Serdeştê peşmer-
gan bixwazin. Lê xet hatibûn
birîn. Merivên hikûmatê ji be-
rê de tedbîr girtibûn û di-
xwastin bi tehrîka Naxadê şe-
rekî mezin bidin çêkirin. Qa-
sidên kurd bi awayên din Ma-
habadê agahdar kirin û berê
êvarê qasi 4000 peşmargên
kurd dorêoli Naxadê digirtin,
rêyan dikirin destên xwe û du-
sêyekên bajêr bidest dixis-
tin. Lê dotira rojê, hê di
berbangê de ordî bi helîkop-
terên xwe mewziyên kurdan
bomba dikirin, ji Wirmê, Me-
shed, Qom, Tehran û Şîrazê
Pasdaran digihand Naxadê. Tank
û top li nêzî Naxadê dicivi-
yan û Tehran rawestîna şer,
valakirina bajêr û têkiliya
ordiyê dixwast. Li gora li-
hevhatinê, diviyabû ku kurdên
bajêr berbi Mahabadê û Tirk
jî berbi Wirmê bîn valakiri-
nê. Ewê tankên ordiyê roja
22ê nîsanê, saet di 16an de,
biketana Naxadê.

Kurdan, bi piranî, bajêr va-
lakir. Ordî kete bajêr û bi
xwe re bi hezaran Pasdarên
çawsor, dijminên kurd anî. Pê-
re, talan û kuştin destpêkiri
di taxên kurdan de. Me bi çav-
vên xwe li hewşa Mizgeftê
cendekên jin, zaro û pîrên
kurdên serjêkirî, dest, pê,
pozanguhbîrî, di xwînê de ge-
vizî dît. Yê ku nexwastibûn
an nikaribûn di wextê da tir-
ka mala xwe, bajarê xwe bikin
bi destên Pasdarên rikdar û
xwinrêj hatibûn kuştin. Hej-
mara wan? Çend sed kes. He-
zar li gora hînet kanîyan.

Kurdan Naxadê wînda kir. U
ev destpêka şerê giştî yê na-
yerevîn bû. Serekeşîr, mela,
xort, keç ji çaraliyên Kurdis-
tanê dibeziyan Mahabadê, di-
xwastin şerbikin. Cava ku em
ji Naxadê vegeriyan Mahabadê

serbajarê siyasiyê kurdî wekî roja mehşerê bû. Hinan miriyan vedişartin, yê din bi ciwankirina muhaciran bilî bûn.

Me ji Dr. Qasimlû pirsî : Di rojên 20 û 21ê nîsanê de, peşmergekên we serdest bûn, Naxadê di destê we da bû. Çima we wan parakîşand ?

- Ku me serî li ber biryara hikûmatê ne tewanda diviya bû me xwe jî şerê giştî û vekirî re amade bikira. Em hê jî şerekî awa ra havilkar nîn in. Şerekî bêwext ewê serê tevgera me ya azadîxwaz bixwe. Ji me re salekî lazîm e, salekî aşîtiyê. Paşiyê ewê tu qewet nikaribe me biparçiqîne.

Lê karbidestên Iranî jî girîngiya wext dizanibûn û ne-

dixwastin keysa xurtbûnê bîdin tevgera kurdî. Tehrîk, navtêdan û kuştinan zêde dikirin jibo şer rojekî zûtir biteqîn. Di destpêka gulane de hêviyên azadî û serfiraziyê xurtbûnê li Kurdistanê. Li bajarên, gundî biserbestî ji her rengî çek û tîfîngan dikirin û jibo cêribandina wan heykelên şah nîşan digirtin. Bî dehhezaran xebatkar, xwendekar, bajarî an gundî di kuçe û kolanan, di meydanên Qazî Mihemed de jibo azadî û demokrasiyê dimeşîyan, reng û rûçikekî nû didan bihara Kurdistanê, xewnên kevnên gelê kurd pêk tanîn. Bedew bû, wekî azadiyê delal bû, bihara 1979 an li Kurdistanê - Iranê.

NÛÇEGIHANÊN AZADÎYÊ

İLON 1979 SS ÊN XOMEYNÊ BÎ HOVÎTÎ 67 GUNDÎYÊN QARNÊ KUŞTIN



Bûyerên Kurdîstana Iranê di nav hefteyên da wîn de di rojnama, kovar, radyo û televîzyonên ci-hanê de cîyekî pîr mezin girtin. Heta niha, di tu dewranê de, ev qas qala Kurdan bi dilxwazî û dostanî ne hatibû kirin. Tenê ji hildana nav û hejmarên rojname û kovarên ku li ser Kurdan nûvîsîne rûpelên kovara me têr nakin.

Şerê brakujê ku sazûmana paşverûya Iranî li dijî gelê kurd îlan kir heyecanekî mezin da peyda kirin. Li gelek welatan, demokrat û pêşverûyên navdar, partiyên çep û sendîka li dijî vî şerî rahûn, nasîna mafên gelê kurd xwastin. Karker û xwendekarên kurd jî di tanga xwe da li dijî şer, ji bo maf û azadiyên gelê kurd, jîbo rawestîna kuştin û qirkirinên Kurdîstanê meş, civîn û daxuyanwerîyan (numayîşan) kirin.

Fransa

★ 5 roj piştî gotara dijî-Kurd a Xomeynî, roja 22.8.79 berpirsiyarên partiya Komunîst, partiya Sosyalîst, partiya Sosyalîsta Yekbûyî, tevgera radîkalên çep û yên sendîka (CGT, FEN) li merkeza Federasyona Navneteweyîya mafên mirovî (FIDH) civîyan û li ser pîrsa Kurdîstanê dîrûdirêj peyivîn. Paşî, ev partî û sendîka wisa ji sendîka CFDT û FO, da nezanan derxistin û tê da rawestîna şerê Kurdîstanê û ya qirkirîna gelê kurd, nasîna mafên gelê kurdê otonomiyê, mafên xebata serbest jîbo hemî partî, sendîka û rojnamên Iranê xwastin (Binêre rojnama LE MONDE a 14.9.79 jîbo kurtiyariya van danezanan).

★ 3000 karker û xwendekarên fransîz roja 31.8.79 li ser gazîya hêzên çep û sorşerger (LCR, LO, OCI, h.w.d.) li ber balyozxan

na Iran a Parîsê meşîyan û rawestîna şerê Kurdîstanê, nasîna mafên gelê kurd, azadiya siyasî ji bo hemî partîyan, berdana 14 endamên Partiya Sosyalîsta Xebatkarên Iranî xwastin. Meşandin ji saet 18.30 heta 21 dom kir. Karker û xwendekarên kurdên Fransayê di serê vê meşandinê da bûn (binêre wêne).

★ GREVA BIRÇÎBÛNÊ di dêreki merkeza Parîsê: ji 22 heta 28 ê tebaxê 17 xwendekarên Kurdên ji her aliyê Kurdîstanî hatî tevî du biyaniyan (Fransîz û Japonî) jîbo ricimandîna şerê ku li dijî gelê kurd ê Iranê tê kirin xwe birçî fîstî. Televîzyonên Fransa, Luksembûrg, Hollanda û Belçîkayê hatin bigîrevanan re mûlaqat çêkirin. Qasî du hezar kes hatin dêrê dilxwazî û dostaniya xwe nîşan dan, arîkariyê dane Kurdan, bend, wêne û agahdarî

yên raberkirî xwen-din. Roja dawî civîna ka çapê çêbû û ji rojnamevan û ajansan re li ser rewşa Kurdîstanê agahdariyên fireh hatin dayîn.

★ KURD LI CEJNA L'HUMANITE

Rojnama merkeziya Partiya Komunîsta Fransayê îsal cîyekî berbiçav da Yekîtiyên Xebatkar û Xwendekarên Kurdîstanê da ku ew rewşa gelê kurd bi sedhezaran kesên ku di du rojan (8-9 îlon) têtên vê cejnê çêtir bidin nasîrinê. Standa Kurdîstanê eleqekî mezin dît. Berî cejnê kovara C. G. T. (sendîka nêzî Partiya Komunîst) ku xwediyê bêtirî 3 milyon endaman e, benderkî 3 rûpel li ser Kurdan derxistibû Sernvîsa wê: "18 milyon xerîb di welatê xwe da!" Bi awakî giştî, rojnamên komunîst û sosyalîstên Fransa, Italya û Ispanya bi awakî vekirî û zelal piştgiriya ge-



lê kurd dîkin. Li Firansa Komîta Merkezî ya Partiya Komunîst, serokatiya CGT, sekretariya nav-neteweyî ya Partiya Sosyalîst, Grûpa meb'ûsên sosyalîst li Meclisê nemi nendeyê (temsîlkarê) kurda bi awakî resmî qebûl kirin û jê re cardin kirin ku ew di vî şerê dijwar de

piştta gelê kurd digirin.

- Xwendekar û xebatkarên kurd ji Kurt Waldheim, Fidel Castro û Bazargan li ser rewşa Kurdistanê Iranê têl kişandin. Bi hezaran belavokên agahdarî û piştgiriyê hatin belavkirinê li Fransayê.

nê. Bendvîsê TASS ê V. SEROV dixê bîrê ku Iran dewletekî pirneteweyî ye û ku şahîti gelên Kurd, Azerî, Tirkmen û Ereberperçî qandîye, ji mafên wan bêpar histiye. Nasîna mafên van gelên jibo sazûmaneke pêşverû pêwîstî ye.

Belçîqa

Gelek komele, parti û sendikayên belçîqayî di danezaneke hevrayî da hincirandina gelê kurd û yê hêzên demokratîkên Iranî mehkûm kirin, nasîna maf û azadiyên demokratîk û ya mafên neteweyîyên gelê kurdî xwastin. Hevalên "Têkoşer" vê xebatê siyasî pêk anîn.

Swêd

Li Swêdê xwendekarên kurd bi greva birçîbûnê û meşên protestoyê li dijî qirkirina gelê kurdê Iranê rabûn û bala xelkê kişandin ser bûyerên Kurdistanê. Rojname, radyo û televîzyon bi xweşî qala Kurdan kirin. Wezareta derve kariyê kuştinên Kurdan protesto kir.

Elmanya Federal

- 2000 karker û xwendekarên kurd, ên KOMKAR û AKSA, tevî demokratên Elmanî roja 25ê tebaxê li kuçên Frankfurtê meşyan, sazûmana pêşverû û fanatik a Xumeynî ricimandin, jibo gelê kurd azadî û otonomî, jibo gelên Iranê demokrasî xwestin. Eynî

rojê xwendekarên demokratên Iranî yê komela CISNU li serbajarê elmanî BONN, jibo van armanc û xwestekan meşyan. Çend roj berê di salê li BONN qasî 50 xwendekarên kurd li ber balyozxana Iranê daxuyanweriyekî kirin.

Sovyetistan

Kurdên sovyetî ji serokatiya Partiya Komunîst re têlan kişandin û jê arîkari kirina şerê pêşverûyê gelê kurdê Iranê xwastin. Çapa Iranî û hin rojnameyên Ewrûpa nivîsin ku Sovyetî piştta Kurdan digirin û arîkari didin wan. Di bend û şirove

kirinên xwe da rojname mên PRAVDA (Rastî) û IZVESTIYA (Nûçe) wisa jî ajansa TASS dan zanîn ku şerê kurd jibo xweseriyê (otonomiyê) meşrû ye, pirsê Kurdistanê bi tedbîrên leşkerî, bî tank, bombavêjên PHANTOM û helîkopterên COBRA nayê safikiri-

XWESTEKÊN

GELÊ KURD



Roja 28ê adarê delegasyoneka Komita Navendî ya P.D.K. a Iranê li bajarê Qomê rastî Ayatullah Xomeynî dihat û xwestekên gelê Kurdistanê Iranê pêşkêşî wî dikir. Piştî peyivandinên ku nêzî saetekî dom dikin, Xomeynî ji Dr Qasimlû re dibêje : "Şiara we 'Demokrasî bo Iran, xwud-muxtarî bo Kurdistan' ne maqûl e, hun ji riya îslamê averê dibin. Gotinên demokrasî û muxtarî di Quranê de tune ne. Ez nikarim tiştên wilo qebûl kim."

Dr Qasimlû lê vedigerîne : Gelo wisabê ewê cenabê we dikaribe gotarekî bêje an beyanekî derxe li ser wekheviya siyasî, çandî û ekonomîk a gelên Iranê ?

Xomeynî : Iranî hemî misilman in, bra ne. Ayatullah Taleqanî li ser vê yekê beyanekî daye. Beyanekî nû dayîn ne hewce ye.

Qasimlû : Emê dikaribin ji xelkê re diyar kin ku hun bi beyana Taleqanî re ne.

Xomeynî : Naxêr ! Min vê beyanê ne dîtiye û nexwendiyê.

Jibo gîzîrên kurd rewş ronak û zelal e : hêviya bi mizakere û peyivandinan mafên gelê kurd stendin qels e. Hikûmeta nû di xwaze wext karbike, hêzên xwe bi de hev û pirsê Kurdistanê bi şer û zorê "safî bike". Divê ko Kurd bêrawestî xwe ji bo vî şerî rapêşin, amade kin. Rojekî windakirinê ne maye.

Piştî 33 salên şerê dizî û binerdî, piştî zindan û kuştinan, piştî xofa Savakê û zorkariya Şah, gelêkî 5-6 milyonan ji alî siyasî û leşkerî de tenzîm û teşkil kirin, hêsa nîn e. Karê meha, heta ye sala ye. Jê re wext lazîm e. Dereng xistina şer, awîqandina wê ferz e. Loma sermiyanên kurd nahêlin ku pevçûnên piçûk girbibin, bibin sedemê teqandina şerê giştî. Loma ew delegasyonan dişînin Tehran û Qomê, bi hêviya ku ewê mizakereyên dirêj şer biawiqînin,

Memoranduma ku hunêlijêre bixwînin xwestekên gelê Kurdistanê, bi kurtî û xurtî, pêşkêş dîke. Hîmê mizakereyên ku di mehên Adar, Nîsan, Gulan, Tîrmeh û Tebaxê de di navbeyna serokatiya kurd û berpirsiyarên Iranî de li Qom û Tehranê de hatine çêkirin ev memorandûm bû.

memorandum

Hê di destpêka şoreşa Iranê de ya di bin serokatiya Imam Xomeynî, gelê Kurdistanê di sefên pêşîn de bi ezm û mîrxasî li dijî sazûmana (rejîma) taxûtî (şeytanî) ya Şah şer kir. Ewî heta serfirazîya dawîn singê xwe da ber vî şerî: axa Kurdistanê bi xwîna şehîdan hate avdanê. Di meşandin û pevçûnên hemberî polîs û leşkerên kirêkirî de têkoşerên kurd bi mîrxasî livîyan jibo pêkanîna armancên xwe yên neteweyî (millî).

Di vê keftelefta (micadela) jibo qelibandina sazûmana xiriyayî ya Şah da gelê Kurdistanê bi daxwaza sazkirina hikûmeta ku mafên (heqên) neteweyîyên Kurdên Iranê bi de berçavan gîraniya xwe da şer.

Gelê me jibo her du armancên jêrîn şer kir.

1° Qelibandina diktatorîyê û sazkirina, di şûna wê da, sazûmana neke mirovî ya hîrmetkarê azadiyên siyasî û mafên gelên Iranê.

2° Bidestxistina mafên neteweyî yên gelên Iranê di tevayê (şeklê) Xweserî (otonomî) an federasyonê di nav çarçeva Iranê ke azad de.

Zordestiya neteweyî di hemû alîyên jiyana gelê kurd de xwe nîşan dide : siyasî, aborî û çandî. Ya xirabtir ew e ku Kurdên bindest xwedîyêçarenûsa (qedera) xwe nîn in. Gelê kurd dixwaze bibe xwedîyê otorîteyê ku bihêle ew qedera xwe bi serê xwe kifş ke di nav çarçeva Iranê de.

Ewê hemî navçeyên ku Kurd tê de pîraniya rûniştewanan in bikevin nav Kurdistana xweser (otonom). Ji vê bûne, divê ku hoyên (şertên) dîrokî, coxrafî û aborî û wisa jî daxwaza pîraniya rûniştewananê bin ber çavan.

Xweserî an federasyon tevayên taybetî (xisûsî) yên bicihanîna mafê (heqê) çarenûsa xwe bixwe kifşkirinê ne. Heke gelê kurd tenê gelê perçiqandîyê Iranê bûna, ewê eşkerane xweserî bersîva pîrsiyarê bibûna. Lê herwekî li Iranê çend gelên bindest hene sazûnaneke federalî ewê formûla qenc-tirîn be.

Di her du formûlan da jî karên hîmîyên dewletî ewê dibin otorita tejî û tevayî ya hikûmeta navendî (merkezî) da bin. Ango :

- 1° - Karên derva wekî peywendiyên siyasî, ticarî û malhebûnî (malî) bi welatên biyanî (ecnebî) re.
- 2° - Parastina tixûbên (sînorên) Dewletê wisa jî ya Serxwebûn û azadîya gelên Iranê dijî her tecawiza biyanî.
- 3° - Karûbarên (faaliyetên) Banka Navendî wekî derxistina dîrav (pere) û kirîn-frotana dîravên biyanî.
- 4° - Projeyên domdrêjên gir û gelek mesrefdar.

Ewê organên xweser ji karên hindûrî berpirsiyar bin. Polîs û Cendirme dikarin bibin mînakên (mîsalên) baş jibo ronakkirina mana Xweseriyê. Ewê leşker (ordî) bi hikûmeta navendî ve girêdayî be gava ku Polîs û Cendirme û hemî hêzên din ên ku dikaribin dewsa wan bigirin, ewê di bin otorîta navçeyên xweser da bin.

Heçî hêza leşkerî, gelê Kurdistanê bawer e ku leşkerê kevnê Şahanîyê paşverû û dijî-gelî divê bê paqij kirin û rûçikê leşkerê neteweyî û gelî bê dayînê. Ev yek jibo peydabûna itimata gelê Kurdistanê xwedîyê giringîyeka (ehemiyeteka) jiyanî ye. Bi kurtî, karê leşker parastina tixûban e. Divê ku ew tucar têkilî karên hindurîyên welêt ne be.

Jibo bicihanîna vê armancê, divê ku garnizon ji bajerên Kurdistanê ber bi nêzikahîyên tixûban bên kişandinê.

Ewê Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê gelê navçeyê bi helbijartinên giştî, yekser û dengêveşarî bibijêre. Ewê Meclîsa Neteweyî icrayî yên Kurdistana xweser kifş ke. Nemînendeyên (temsîlkarên) wê wisa jî nemînendeyên perçeyên din ên Iranê, ewê tevî karên hikûmeta navendî bibin.

Bi temamî eşkere ye ku xwestekên gelê Kurdistanê yên xweserî an federasyonê bi tu awayî li dijî yekîtî û tevayîya erdî ya Dewleta Iranê nîn in. Ji ber vê yekê, gelê Kurdistanê li ber ithamên veqetandinxwazî radibe û li wan wekî çekekî (silahekî) kevn û zingarê sazûmana taxûtî ya Şah dinêre. Ew jî Imam Xomeynî dixwaze ku ew bi awakî resmî û bi dilsozi dîtinên xwe yên derheqa xwestekên gelê Kurdistanê bide zanîn û bifermîne ku mafê çarenûsê gelê Kurd di nav Qanûna Hîmîya ku niha tê hazirkirinê cih bigire.

Di bin serokaiya Imam Xomeynî da, gelê Kurdistanê bi xurtî tevî şoreşa mezin bû. Loma, ew çav lê ye ku ew meşrûyane ji meyweyên wê şoreşê pardar be. Xwesteka hîmî ya gelê Kurdistanê sazkirina demokrazyê li Iranê û xweserîyê li Kurdistanê ye. Ev xwestek dikare di nav çarçeva hikûmeta şoreşgeriya Iranê de bê bicihanîn.

Yê ku jibo gelê Kurd girîng e, nawê komarê nîn e lêbelê têdayîya wê ya rastî ye. Heke Komara Islami vê xwesteka hîmî ya gelê Kurdistanê erêbike ewê, bêguman, gelê Kurd bi xurtî piştî wê bigire.

PARTIYA DEMOKRATA KURDISTANA IRANÊ

KOMÎTA NAVENDÎ

28 Adar 1979

EWÊ ŞER DIRÊJ DOM

dibêje

Pistî îşxala bajarên Kurdistana Iranê, pêşmerge û hêzên siyasî yên kurdî firekîşîyan çiyayên asê ji bo serê gerillayê. Çend roj pey destpêka vî serê nû Marc Kravetz, ji rojname çep a fransîzî LIBERATION (Rizgarî) xwe digihand meqerê soresgerên Kurd û bi heval Qasimlû re mûlaqat çêdî - kir. "Ji îro pêve serê soresgerê xelkê destpêdike. Ewê ser dirêj dom ke, heta serfiraziya dawîn: otonomiya Kurdistanê di Iranêke demokratîk de" jê re got sekreterê giştîyê PDKI. Va ne kerîyên sereke ji benda "LIBERATION" e.

Çiyayên kurdan, 6 îlôn. Sekreterê giştîyê PDKI dîtin. Îro karekî bêwestîyan nîne. Saetên dirêjên meşê dixwaze û gelek nenasî hene li ser vê riyê. Şerkarên PDKI, ji alî leşkerî ve baş techîzkirî, hê xwedîyên girêdanên radyo nînin in - an bi karanîna wan talûkekî mezin dizanin? Peywendî bi piyan û bi siwariya hêstiran çêdibin. Eşkere ye ku di nava rojê de bi cîp û Land-Roverên çûyî û hatin nabe; ew armancên bijare ne jibo helîkopterên hemberên ku çavneriya rê û şiverêyên çiyayên dikin. Loma ez 36 saet li hêviya bersivê, di gundekî çiyê de mam(...)

KÛJAN MEXLÛBIYET?

Sêrekê Partîya Demokratîk saetekî piştî ya qewldayî hate gundekî çar mala ku ji yê min lê şevê derbaskiribû bi piyan 2 saet dûr bû. Çend zi-

lam li pêşiya wî dikîşîyan; du ji wan za bitên rutbe bilind bûn, yek ji leşkerê erdê, yê din ji cendirmê îranî. Ew herdu jî di serokatiya leşkerî ya PDKI da ne.

Hevûdîtina me ya dawîn tam heftekî berê bûbû. A.R. Qasimlû me di menzela xwe ya PDKI yê li Mahabadê, qebûl kiribû. Çend metre dûr de, li qîşlê pêşmerge xwe ha-vîlkar dikirin ji bo êrîşa ku her gav dikaribû destpêke. Du roj bi şûn de êrîş qewimî bû. Pistî pir saetên berxwedanê, 20 km nêzî Mahabadê xetên parastinî (difa') yên kurdî li rojhe-lat û bakûr dişkestin, gava ku bombavêjên Phantom dorhêlên bajar bombe dikirin. Piştî nîvro ya 2 îlônê leşkerên îranî xwe di qîşla ku pêşmerge çend deqîqe berê bilez valakiribûn de bicîhdikirin û Pasdara hêdî hêdî meqerê PDKI dikirin destên xwe (...)

"Min dixwast em hevûdin di şertên ji bo we xwestir de bibîtin, îro hê gelek kêmasiyên me hene lê, hûnê bibîtin, di nav çend heftan da ewê gelek çêtir bibe".

-Hûn biserxwe û mane wîyat xurt xuyane, qewl jibo heftên ku tînin didin. Lê belê piştî ketina Mahabadê û ya muhtemela Serdestê gelek, li derva û li Iranê, difikirin ku berxwedana kurdî jibo demekî dirêj hate şikestin û ku PDKI û hûn bixwe, nikarin zûbizû ji bin vê mexlûbiyetê rabin.

-Kûjan mexlûbiyet? Di mîttînga ku me li Mahabadê jibo derew dextistina agahdarîyên hikûmetê, ku çûyî na min a Sovyetîstanê îlan dikirin, çêkiribû min gotibû ku emê dest bi şereki domdirêj bikin. Me tu car ne gotibû ku emê bajaran biparêzin.

-Dervayî Mahabadê ku ez bawer im ku ev gi liyên we bixwe ne, we

KE


Dr. Qasimlû

kiribû nîşan(sembol).
-Belê, Mahabad nîşana -
nek bû jibo gelê Kurd.
Di destê me de stokekê çekên giran hebû û ev jibo bikar anîna wan keyseki bû.
Me Mahabadê parast lê qasî 20 km derwayê bajêr, ne di nava bajêr bixwe da, ji bo pêşiyê li kûştina xelkê û li ziyanên maddî bigirin. Kîngê ev îndî mikin ne bû, me xwe firekişand .
Em nafikirin ku ji viya ra "mexlûbiyet" gotin pêwîst be. Heye ku hinekan bawer bûn ku emê bêtir di berxwe din. Lê ji bîr me kin ku me hijde roj diberxwe da li dijî sefereki leşkerî yê jibo kîjanî hikûmet çibigre hemî potansi yela amade ya leşkerî û Pasdarên xwe xiste şer. Yê ku li Tehranê an li derva difikirin ku berxwedana kurdi li Mahabadê qe diya dixapin. Em dike vin gîtekî (sâfha) nû. Şerê me hê dest pê ne kiriye.

KÊMASIYEKE ME TUNE YE

-Ango?

-Wektî min ji we ra got, em xwe jibo şerê ketî dirêj, şerê ketî gerillayê di tevahtiya Kurdistanê Iranê de havilkar dikin. Emê heta serfiraziya da wî şer bikin, heta stendina otonomiya Kurdistanê di çarçeva Iraneke demokratîk da.



-Bitenê?

-Em dixebitin jibo a vakirina cepheki hemî hêzên neteweyî û demokratên Iranê, ji Cepha Demokratîka Neteweyî, heta Fedayîna Xelq, Mucahidên Xelq, hwd..

-Zabitên leşkerî Iranê ku niha qîşla Mahabadê îşxal dikin gotin min ku 50 000 pêşmergekî we yê çekdar hene. Ev rast e ?

-50 000? Hinek werimandin tê heye. Yê ku rast e ev e ku piraniya girana gelê kurdi Iranê bi me re ye û em dikarin piştî xwe bidin ezm û sedeqeta bi hezaran meri

vên çekdar.

-Di aliyê hikûmetê da dîsa qala alîkariya sovyetî û Iraqî dikin. Icar hûnê meyil nekin ji xwe re li hevalbendên xurt bigerin?

-Di warê leşkerî bi tenê da, ez dikarim we ewle bikin ku kêmasiyeke me tune ye. Me kewarên (stokên) du qîşlan, ya Serdest û ya Mahabadê, bi xwe re anîye, dervayî yê gelek merkezên cendirman ku me stendibû. Loma em ne hewce darên alîkariya leşkerî ya tu keşti ne. Di warê siyasetî de, em bendewarên artîkariya dostên xwe yê

hemt cihanê ne, art-
kariyeke manewt û û
maddt. Lê emê tu têki
ltyeke biyant di nav
tevgera me da qebûl
nekin.

Lê em ewle (emîn)
ne -niha em li tsaba-
ta vê yekê dinêrin-
ku pîlotên amerîkanê
tevtêrîşên Phantom'
an li dijî Mahabadê
bûne.

-Hûn çawa hîn bûn ?

-Me axaftinên navbey-
na van bombavêjan û
hîma (qatda) wan zebt
û tesetl kir.

-Pîlotên Iranî di
nav hev da bi ingilî
zî na peyivin? Piranî
ya wan li USA hînbû-
ne.

-Belê, lê em dikarin
bi hêsant dengekt t-
rant û dengekt amerî-
kanê ji hev nas kin
(...)

-Lê heke têkilîya a-
merîkanî bê isbatki-
rinê hûnê li nêzîkbû-
yîna Yekîtiya Sovye-
tî negerin?

-Di dema sazûmana
kevn da, em timt bi
ajaniya derva, ya Sov-
yetistan an Iraqê di
hatin sûcdar kirin.
Iro dîsa eynt çtrok
e, bi zêdebûnekt nû:
em tca bûne ajanên
siyonîstan jî! Hesab
bikin: heke ku hûn bi
sêrvekin ku li gora
propaganda resmt em
dijî-şoresgerên fro-
tîyên emperyalîzmê,
kommunîstan û dîyo-
nîstan in û ku em di
eynt wextê de pêgir-
tîyên Yekîtiya Sovye-
tî, Iraq û Israîl in!
Ev yek ji we re dije
hev xuya na ke? Diyar
e ku li Tehranê ev
qas dijhevî wan aciz
nake (...)

-Cava ku hûn qala şe-

rekî domdirêjê gerîl-
layê dîkin, hûn dixw-
zin çî bêjin?

-Ku ewê şerkarên me
li herciyî bin û li
tuciyî nîn bin. Li se-
rê çîyan û li deştan.

-Û li bajarên?

-Li wir jî. Bo çî na?
(...)

DIJMINÊN ME PASDAR IN

Li ser pîrsa "ewê
şerkarên we çî bikin"
serekê PDKI dide za-
nîn ku niha ew gira-
niya xwe didin xeba-
ta tenzîm û organî-
zasyonê, ku ewê ji bo
bicihanîna armancên
xwe hemî awayên şer-
bikarbînî û bi ser-
ve dike: "em narwazî
şerê ordiya trant bi-
kin. Heke ew di şûna
xwe da bimîne, tene
bi karê xwe (ku paras-
tîna hidûda ye şerê
me kirin nîn e) bilt-
be, heke ew têkilt se-
kên me û Notirvanên
Şoreşt (Pasdar) ne be,
emê tiştêkt li dijî
wê nekin (...). Dijmi-
nên me Pasdar in. Ni-
zanim ew bi rîka ne-
teweyt, sovent an dt-
nî -ştî dijî sunnî-
yan-dilivin, lê nett-
ce li meydanê ye; ev
merivên han li Kur-
dîstanê wekt Naetîyan
hereket dîkin!

Dr Qasimlû qirki-
rina gundê Qarnê (bin
hêre rûpel 19) bi bîr-
tîne û dibêje ku li
bajarê Saqizê 30 ke-
sî gullekirine, di
nav wan da tenê end-
mekî Partiyê hebûye.
"Ji wê rojê ve, sefe-
reke navneteweytîya
pir mezin jîbo me çê-
bû. Heye ku ev wan da
fikirandin. Sedemên
dî jî hene. Di nav -
beyna hikûmet û komî-

tan de mişkileyê be-
reberê zêdetir peyda
bûn, tevgera ordiyê
jî giraniya xwe nî -
şan da. Merivên rea-
lîst tê digihên ku
pîrsa Kurdîstanê bi
işxala Mahabadê nayê
saftkirinê. Bazargan
van rojan gotinên ge-
lek bihezirtir gote.
Di milê din de, di
destên me de girtî -
yên wan jî hene".

-200 girtiyên ku we
qala wan kiribû di
peyivandina me ya pê-
şîn da? We ew bi xwe
re anî ne?

-Belê, çendên ku me
berda, ne tê da.

-Gefa we ya kuştina
wan hê bi cî ye?

-Ev bi tevgera hikû-
metê ve girêdayt ye.
Her wekt hûn dizanin
mê çar kesan kuştî
ji wê rojê ve ewan
gullekirina Kurdan
dan rawestî.

-Nehkemên islamî ji
destpêka şer bi vir
de biryara çend kuşt-
tina dane?

-Qasî sedekt.

Serekê PDKI û mîr-
alay Aliyar û Rabîlî
li ser pîrsên ordiyê,
serhilanînen ku tê
de li gelek ciyan te-
qîyane xeberridî. Bi
gotina wan di ordiyê
da "Teşkilata Ordîya
Azad a Iranê" hatiye
danîn û armanca wê
rizgarkirina Iranê
ji hikmê dînî ye. "Ew
jî wekt me jîbo aza-
diyê şerdikin û ba-
wer in ku divê mafên
neteweytîyên gelên
bindest bînanaskiri-
nê. An na, ewê Iran jî
bibe Libnanekt dî,
ji hev keve, perçe bi-
be" dibêje mîralay
Aliyar. Bi ya wî "di-
vê ku zabîttî û leşker

qışlên xwe bigihînin
şerê xelkê, pêre şerê
gerîllayê bikin jibo
Iranêke demokratîka
bê Şah û bê mela".

PIRSA YEKÎTIVÊ

-Li Kurdistanê bixwe
hin komele, bêy ku
xurtahiya wê têxin
şikê, gelek rexneyan
li we dikin û xasme
dibêjin ku mafê xwe
yî bi tenê li ser na
vê gelê kurd peyivîn
tune ye. We qala saz-
kirina cepheyekî yek

nîn e. Em demokrat in
û dixwazin ku di tev
gera kurdî da her
kes bê temsîl kirin,
ku her kes bikaribe
bipeyive, xwedî deng
be. Lê divê ku paşiya
paştî yek dikaribe
biryara dawî bîstî-
ne. Her yek dikare bi
bîne ku PDKI temsîl
praniya fireha gelê
kurd dike. Heke pêş-
yara serokatiya me
bê qebûl kirine, jibo
tevkariyê, bi hev ra
xebatê tu pîrs na mî
ne. Heta niha me hê

kin boykot bikin? Ge-
fê li bajarî an gire
girên ku di wan de
cihbigirin bixwin?"

-Na, em dizanin û ci-
han hemî dizane ku
gelê Kurdistanê Ira-
nê bi me re ye. Divê
ku yek bibê serekbe-
lediyê Mahabadê, ku
yekî din midîrê edlî
yê, hwd.

Evana hemî normal
in û emê li kirinên
wan binêrin(...)

Di pîrsa xwe ya
dawî da M. Kravetz
dibêje: niha havîn e,
dinya xweş e li serê
çiyân. Hê hewesa mîlî
tanên we yên ku ji
bajaran tîn wek hef-
teyên pêşîn xurt e.
Gelo hûn na tirsin
ku ev kel bikeve ga-
va ku dijwarî peyda
bibin û jiyan li "wê
derê bihatina zivis-
tanê zehmettir bibê!"
Bersiva serekê PDKI:

LI SERÊ ÇIVAN EM

LI MALA XWE NE

"Em ji leşker û Pas-
daran çêtir hînkî zî-
vîstanê bûne. Niha
rewş jibo wan misaît
tir e. Zivîstanê, balâ
fir û helîkopter ne-
ma dikarin tîstekt
bikin. Heçî tank, ewê
ji bînt nikaribin
bilivin. Gelê me, dî
hemû dîroka xwe da,
di demên zordestî û
stemî de xwe kîşan-
diye serê çiyân. Iro
ew dîsa li serê çî-
ya ne û heye ku ev
ne jibo cara dawî
be. Li serê çiyân ew
li mala xwe ye û ew
pê dizane. Bawer kin
ku çiyayên kurd asê
yî yeke wisa ye ku
stendina wan ewê hê
san ne be". ▼ ▼ ▼



bûyî jibo hemû Iranê
kir. Hûn pêkanîna teş-
kîlatekî yekbûyî yê
tevayîya tevgerên
Kurd jî nafikirin?

-Min bi awakî vekirt
bersiva van komelan
da û ezê ji we re jî
vekirt xebêrdim. Tev-
kart, an peywendiyên
xebatê danî mîmkîn
e û em lê digerin. Lê
me ronak kir ku ev
bê serokatiya PDKIna
be. Ev ji aliyê me da
daxwazeke serdestiyê

bersiveke ronak ne
stendiyê lê ez bawer
im ku ewê pêşneyara
me bê qebûl kirinê.

Dr Qasimlû, ber bi
dawiya vê peyivê di
bêje ku ewê rûnişte-
vanên bajarên imka-
nên "qanûnî" heta da-
wiyê bikarbînin, bi
her awayî derxistina
Pasdaran bixwazin û
bikin ku leşker ji
qışla dernekevin. Roj
namevan jê dipirse:
"Hûnê sazendeyên ku
otorîteyên nû rast -

PİRSA BARZANÎ (?)

Pîrsa Barzanî pirseke berbiçava dtroka me ya hêmdem e. Dahûrtnt û zelalkirina wê jibo qenc nasîna civaka kurdt, jibo rontkirina riya şoreşgerên Kurdistanê ferz e. Me heta niha li ser vê pîrsê çend bendan nivîst û mirina wî (2.3. 1979) bû westle jibo tehlîleke giştî. Piştî bibîranîna zarotiya wî, şerên wî yên salên 30 û 40 û jiyana wî ya Sovyetistanê, em di vê hejmarê da rola wî ya di tevgera çekdarî ya Kurdên Iraqê (1965 - 1975) bi kurtî pêşkêş dikin û li ser barzanîzmê dimînin.

Di veqer xwe ya Iraqê de Barzanî ne bi Kommûnîstiyê ne jî bi demokrasîyê bawer bû; neteweperestekî xwerû, dîndar, bi edet û awayên eşîretî ve girêdayî bû. Lê di dîtinên wî yên siyasî de hin guhêrandin çêbûbûn. Jibo wî, her wekî ku yên wî qenc dînasin nivîsîn û gotin, siyaset jî serî heta binî derew bû, xapandin bû. Bername, bingeh, gotar, wa'd hemî awa û wasita ne jibo gihîştina armancekî. Jibo vê armancê kirina her tiştî li rê ye. Himin serê hemîyan xurtahî ye, jibo xwe qewî kî bi şeytan re jî hevalbendî kirin ne xirabe. Li cihanê di dewletên mezînan hene: USA û Sovyet. Bê arîkariya yek ji wan serketina Kurdan mimkin nîn e.

Xêza siyasî ya tevgera da-wînan a Kurdên Iraqê di nav van çend dîtinên tehlî, bedbîn û bêbingehên han da ne. Ewê hê di sala 1959an de, li dijî bingehên demokrasîyê, Barzanî bibe serokê PDKê û di bin baskên wî de Ibrahîm Ehmed û zavayê wî Celal Talabanî serokatiya helbijartî, meşrû û pêşverû ya PDKê bi zora tîfîngan tasfiyekin, bikevin şûna wê.

Rojên azadî û serbestiya siyasî yên ku bi Şoreşa 14 Temmû zêdestpêkiribûn ewê pir domane kin. Tîrsa darbekî zabitên neteweperest û dijî-kommûnîst Qasim ber bi qedexekirina xebatên Partiya Kommûnîst û PDKê dibin. Salekî piştî şoreşê PKI

tê girtinê. Dûra, berebere kovar û rojnamên pêşverû tînan qedexekirin. Barzanî têdigihê ku demastema kurda jî nêz dibe û bi dizî xwe digihîne navçeyaya Barzan. Şerê Kurd û hikûmetê dikare bi manîyeke piçûk biteqe.

Ev manî di destpêka îlona 1961an da peyda dibe. Qasim bom bavêj û leşkerên xwe dişîne ser "axa û xwedîgundên kurdên dijî reforma erdê". Gelek gundên kurd tînan şewitandinê. Barzanî biryara parastina wan didin û şerê çekdarî wilo destpêdike. Demekî şûn da ewê "Mekteb siyasî" ya PDK jî bigihîje vê biryara şerê çekdarî. Salên pêşînan şer dijwar in û Kurd tenê bi hêzên xwe û bi saya arîkariya Kurdên Tirkîyê û Iranê di berxwe didin, nayên perçiqandinê. Di destpêkê da hejmara pêşmergan ji hezarî kêmtir e. Lê ewê berebere hejmar girbibe û navçeyên rizgarkirî fireh bibin.

Roja 8 sebat 1963an Qasim bi destê Baasîyan tînan kuştin. Baas di milekî da xwe dide qirkirina kommûnîstên "dijminên neteweyê ereb" û qasî 7000 jî wan dikuje, di milê din de jî bi nemînendeyên Barzanî re (Talabanî serekê delegasyonê ye) li ser xwestekên Kurda dipeyive, siyaseta "perçe ke û îdare ke" dimeşîne. Lê di 18. 10. 1963an de mareşal Abdul Salam Aref Baasîyan jî karîne (iktidarê) dîr xe û di 10ê sebat 1964an

de bi Barzanî re lihevhatineke agirbirîyê çêke.

Fetlaneka 1964 a

Ev lihevhatin fetlanekeke mezin e di şerê çekdarê Kurdên Iraqê de. Dijhevîyên hindurî, şerê jîbo karîne ku ji zûve li nav tevgerê dikeliya, bi vê wesîle dide der, diteqe. Koma "mekteb siyasî", Ibrahîm Ehmed, Talabanî û hevalên wan neqaîlbûna xwe ya lihevhatina Barzanî-Arif didin zanîn. Ew bawer in ku pîraniya pêşmergan ewê bi wan re bimînin û Barzanî bê tasfîye kirin. Nenasîna civaka kurdî, xeletiyên goşîst ewê wan ji vî şerê meşrûyê jîbo karîne berbi kortalên bêbextiyê û hevalbendîya sazûmanên Iran û Iraqê bike. Li dora wan hejmarekê kêmî pêşmerge dimînin û ew nikarin şerê Barzaniyan bikin, direvin Iranê. Şah wan çekdar û xwedî dike dişîne ser Barzanî, ji bo tevgera kurdî mecbûrê bi Şah re lihevhatinê bike!.. Lê çekên Şah jî dest nadin wan bi "hereketê eşaîriyê Barzanî" serî derkevin. Ewê îca dest bi hevalbendîya Bexdayê bikin, li ser bajarê Iraqê rûnin, rojname xwe "Al-Nûr" bi perê hikûmetê derxin. Û rûreşîya mezin, gava ku balafrî û bombavêjên Iraqî gundên Kurdistanê dişewitînin ewê ev "şoreşgerên tûj" jî tevî "pêşmergên" xwe herin arîkariya hikûmetê bikin.

Şahê Kurdistanê

Ev siyaseta şermezariya ku Talabanîst li ser navê "çepî-tî" û "şoreşgerî" dikin ewê di nav xelkê de li dijî xwendî û pêşverûyan nefret, şikbirî û rikdarî bide peyda kirin û ewê hawirên paşverû baş vê yekê bikar bînin berebere hemî pêşverû û demokratan ji nav tevgerê dîrxin. Di 1974an de îndî li çepbûnê bi çavê "xayîntiyê" tê nêrîn. Celek şoreşgerên kurdên Iraqê û Iranê ewê jîbo çepîtiya xwe bînin eşandin an kuştin.

Piştî veqetandina Talabanîstan, Barzanî serokatîyeke nû

kifş dike jîbo PDK. Ew îndî li xwendîyan bi çavê "xayinan" di nêre û ji xwe li dora wî jî îndî kesên xwendî çibigre qet neman. Yê ku hene ji gotina Serok dernakevin, bicihanîna feramanên wî ji xwe re wezîfe dîzan. Partî tenê bi nav heye. Ew jîbo gihandina siyasîya pêşmergan û gundiyan Kurdistanê xebatekî na ke. Wezîfa her yekî feramanên Serok bicihanîn e. Kî jê piçek gazinan bike, bê mînaqêşe û mehkeme dibe "xayîn". Di nav çiyayên Kurdistanê, li ser 35-000 km2 erdên rizgarkirî Barzanî îndî serwerekî tewna (mutleq) ye, Şahê Kurdistanê ye. Wezîrên wî her du kurên wî yê nezan û nexwendî, Idrîs û Mesûd in. Idrîs berpirsiyarê pêşmergan, siyaseta hindur û malîyê, Mesûd jî yê parastinê (Savaka kurdî) ye. Serekhêz û berpirsiyarên giregir hemî Barzabî ne û xwe dispêrên otorîta kevnare ya Mela û serekeşîran. Pêşmerge pirîcar li dû axayê, jîbo axayê xwe dikeve şer, ne ji ber serwextî û zanîneke siyasî.

Li derva siyaseteke keysperest, bê bîngêh tê ajotin. Welatên sosyalîst arîkariya tevgerê dikin lê berpirsiyarê nêkurd ji 1966 şûn da bi Şah û Israîl ra jî peywendî datînin. Barzanî bixwe çend caran diçe Tehran û Tel-Avîvê jîbo xwastîna arîkariyê. Piştî 1972an CIA jî tevî 16 mîlyon dollarên xwe yê bi navûdeng dikeve govendê û tevgera kurd bi vî awayî li ber çavên hawirên pêşverûyên cihanê reş dibe, tecrît dibe.

Her çar salên dawînen jiyanê Barzanî, bêgûman, ji hemîyan tehlîr û diwartir bûn ji bo wî. Ev şerkarê sedsala 19an, meyweyê civaka kurda ya berê, piştî salên dirêjên şerê jîbo Kurdistanê xwe li şarîstanan mir. Dost û berdevkên wî yê doberê xwe jê zivartibûn. Û ewî lanetê li vê cihana tevliheva bêbext, xwediyê awa û edetên jîyê mîraniya berê dîr, dibarand.

HEJMARA KU TÊ:

barzanîzma bê barzanî
rewşa li kurdîstana îraqê

◆◆ ENIYA ◆◆

g a z î

Em Komela Xwendekarên Kurdistan li Derveyt Welat (AKSA) û Yekîtiya Xwendekarên Kurdistan li Fransaya di nav rojên 24, 25 û 26 tebar 1979 an de li Almanyaya Federal, bajarê Frankfurt di Kongra AKSA ya 20an de beşdar bûn.

Di dawiya gelek a xaftin, rexne û xwe rexnekirin de me bi hev re ev biryara jêrîn stand:

- Komela Xwendekarên Kurdistan li Derveyt Welat (AKSA) û Yekîtiya Xwendekarên Kurdistan li Fransaya dan û standin bi hemî rêxistin û komikên xwendekarên Kurdistanê yê pêşverû, demokrat û sosyalîst re ji xwe re dikin bar û armanc.

- Jibo bicîtkirina vê armancê ev her dû komele amadekirina civîneke jibo xebateke yekgirtî peywest dibînin, ku nêzîkahiya bîr û bawertî di navbera wan xwendekarên de peyda bike.

- Armanca wê civînê ew e ku rêbaz û destûrên van rêxistinên bide ber hev da ku jibêrê yek rêbaz û destûr bêye danîn.

Em bawer in ku ev biryara me ewê gavekî be jibo civandin û nêzîkkirina piraniya xwendekarên Kurdistan.

AKSA: P.O. BOX 210371
1- BERLIN 21

◆◆ Y. X. K. F.: MALA KURDA
◆◆ 6, RUE CHAPPE, PARIS 18

◆◆ XWENDEKARAN ◆◆

gavekî berbi yekîtiyê?

Çend roj piştî civîna AKSA "Tala-banîst", AKSA din jî kongra xwe ya sa lewextî rojên 24-25-26ên tebaxê li bajarê Frankfurtê (Elmanya Federal) çêkir. Xeynî nonêrên ji bajarên Elmanya û ji Berlîna Rojava hatî, komekî karker, mêvan û nêrevan (ji Fransa, Siwêd û ji AKSA din) tê da beşdar bûn. Li ser navê PDKa Iranê Dr Hesen Şete wî agahdarî da li ser rewşa Kurdistanê û gote ku yekîtiya tevgera xwendekarên Kurdistanê jibo qenc arîkariya şerê azadîxwazê gelê kurd pêwistî ye, ferz e.

Mesajên ji derva şandî (wekî Seydayê Cegerxwîn) û hevalên mêvan jî li ser pêwîstiya yekîtiyê man û ev pirs, tevî qewimandinên Iranê, cihekî berbiçav girt di karên kongrê da. Dem ne ya pevçûnên komik û fraksiyona ye; di vê ku welatparêzên kurd xwe ji vê çarçeva teng bifilitînin û li ser pirsên sereke zemînekî hevrayî yê xebatê bibînin, dengê gelê şoreşgerê Kurdistanê li derva bi xurtahî bidin bihîstin. Divê ku komeleyeke pêşverû û yekbûyî yê xwendekarên Kurdistanê ciyê xwe di nav tevgera navneteweyîya xwendekarên de bigire. Ev wezîfeya şoreşgeriya hemî xwendekarên e. Divê ku her yek bi zihnîyeteke berpirsiyar, fireh û ji sektarîzmê dûr jibo serfiraziya doza yekîtiya xwendekarên welatparêz, pêşverû, demokrat û sosyalîstên Kurdistanê bixebite.

Kongra AKSA yê bi piraniya denga sazîkirina Komîsyoneke yekîtiyê biryar da. Piştî sazîkirina Komîsyonê bi nemînendeyên xwendekarên Fransaya re civîn çêbû û gazîyê hevrayî hate nivîsîn û belavkirin jibo yekîtiyê. Ev gavekî berbiçav û şayanê pîroziyê ye di riya yekîtiyê de. Gava ku tê, bi komele û komikên xwendekarên kurdên pêşverû re peywendî danîn û civandina wan e. Jibo peyivandin, amadekirin destûreke qenc demokratîk û pêşverû. Paşiyê, ev hêviya me hemîyan e, ewê kongrekî yekîtiyê bicive û tevgera xwendekarên ji belawelayî û qelsahiya xwe ya îro xelas bike.

Azadî, hevalên AKSA û YKXF yê jibo vê gava berepêş pîroz dike û hêvîdar e ku ewê xwendekarên kurd li hemî welatên Ewrûpayê xwe bigihînin hev, bi Komîsyona yekîtiyê ve peywendî deynin.

◆◆◆◆◆ NÜÇEGİHANÊN AZADÎYÊ ◆◆◆◆◆


ZMAN

Ferhengok

aborî: (t) ekonomî; (f) économie
 alîgir: (t) taraftar; (f) partisan
 ango: (t) yanî; (f) c'est à dire
 aqar: (t) yüzölçümü; (f) superficie
 arizî: (t) özel; (f) privé, particulier
 aşîti: (t) barış; (f) paix
 bal: (t) dikkat; (f) attention
 baldar: (t) dikkatli; (f) attentif
 bejî: (t) kara; (f) terre, continent
 berxwedan: (t) direniş; (f) résistance
 beşdarî: (t) katılma, iştirak; (f) participation
 biryar: (t) karar; (f) décision
 boran: (t) bunalım; (f) crise
 bosedî: (t) yüzde; (f) pourcentage
 bûyer: (t) olay; (f) évènement
 civak: (t) toplum; (f) société
 çap: (t) basım; (f) presse
 çîn: (t) sınıf; (f) classe
 dane: (t) verî; (f) donnée
 danûstan: (t) mübadele; (f) échange
 daxuyanwerî: (t) gösterî; (f) manifestation
 destgîr: (t) somut; (f) concret
 dijwar: (t) güç, zor; (f) difficile
 dirav: (t) para; (f) monnaie, argent
 dîrok: (t) tarih; (f) histoire
 dudilî: (t) teredüt; (f) hésitation
 enî: (t) cephe; (f) front
 erdçînî: (t) tarım; (f) agriculture
 ewle: (t) emîn; (f) sûr, certain
 gef: (t) tehdit; (f) menace
 gel: (t) halk; (f) peuple
 gelha: (t) nüfus; (f) population
 girîng: (t) önemli; (f) important
 gotar: (t) söylev, nutuk; (f) discours
 hwd (herwekî din): (t) v. s. (f) etc.
 hêsan: (t) kolay;
 hoy: (t) koşul; (f) condition
 karîn: (t) iktidar; (f) pouvoir
 kolan: (t) cadde; (f) boulevard
 meqer: (t) karargah; (f) siège, PC
 nav-neteweyî: (t) uluslararası; (f) international
 netewe: (t) ulus; (f) nation
 netewahî: (t) milliyet; (f) nationalité

notirvan: (t) nöbetçi; (f) gardien
 nuçegihan: (t) muhabir; (f) correspondant
 paşverû: (t) gerici; (f) réactionnaire
 peywendî: (t) ilişki; (f) relation, rapport
 pêşane: (t) öncel; (f) primordial
 pêşverû: (t) ilerici; (f) progressiste
 pêwîst: (t) gerekli, zorunlu; (f) nécessaire
 pispor: (t) uzman; (f) expert
 rûniştevan: (t) sâkin; (f) habitant
 sazende: (t) kurum; (f) institution
 sazûman: (t) düzen, rejim; (f) régime
 şik: (t) şüpheli; (f) doute
 şores: (t) devrim; (f) révolution
 tevger: (t) hareket, tutum; (f) mouvement, attitude
 xweserî: (t) özerklik; (f) autonomie
 xwezayane: (t) doğaldorak; (f) naturellement
 zarav: (t) lehçe; (f) dialecte

NÛYÎTÎ



* - UNESCO, di rêza xwe ya *
 * navdar a "Antolojiya Mûsî *
 * kiya Rohelatê" de sêlike *
 * kî mûsîkiya kurdî derxist *
 * Tê de wêne û nvisarekî *
 * bi sê zmanan (îngilîzî, fî *
 * ransîzî û elmanî) bi kur *
 * tî çand û mûsîkiya kurdî *
 * pêşkêş dikin. Bi hayê sêli *
 * kê (plakê) 25 DM e. *
 * - Le Mouvement National *
 * Kurde (Tevgera Neteweyî *
 * ya Kurdî), Chris Kutschera *
 * ra, Flammarion, Paris, 1979 *

* Stran û Leylan * *

GELYÊ ŞENGALÊ

CEMÎLA CELÎL

Andante

Gel.yê Şen.ga.lê p'a.lê, gel.yê Way.way.kê p'a.lê,
E'.lî beg sya.rê Xe.za.lê. fer.ma.ne ser Şen.ga.lê.

Gelyê Şengalê p'alê, gelyê Waywaykê p'alê,
E'li beg s(i)yarê Xezalê, fermene ser Şengalê.
Emane, xweş emane, E'li beg mîrê şexane,
Mûs(i)lê daye dîyane, boy xatirê êzdyane.

Gelyê Şengalê k'ûre, gelyê Waywaykê k'ûre,
Şexane fûre-fûre, êzdyane nema destûre.
Emane, xweş emane, E'li beg mîrê şexane,
Mûs(i)lê daye dîyane, boy xatirê êzdyane.

Lenîn dibêje

ÇAWA MIROVAHÎ NIKARE BIGIHÊ WINDABÛNA SINIFAN(CÎNAN) BÊY
GEHÎNEKA DERBASÎ YA DÎKTATORIYA SINIFA BINDEST, WISA JÎ EW
NIKARE BIGIHÊ TEVHEVÎYA NAYEREVÎNA(MIQEDERA)NETEWÉYAN TA
KU EW DEMA DERBASOKA RIZGARIYA TEMAMÎ YA HEMÎ NETEWÉYÊN
BINDEST NEJÎ, TA KU NETEWÉYÊN BINDEST AZADIYA XWE YA CIHÊ-
BÛN Û VEQETANDINÊ BIDEST NEXIN.

Oeuvres (Afirandin), 22, p.159



azadî

KOVARA MARKSÎSTA KURDÎ

Jibo nêzikbûyîna hêz, bêşok û ko-
mikên şoresger û welatparêzên Kurdîs-
tanê dixebite.

Bi arîkariya komekî Xebatkar û Xwenda-
karên Kurd derdikeve. Bi tu partî û
hevdesaziyên tu perçeyekî Kurdîstanê ve
negirêdayî ye.

Berpirsiyarê giştî : K Ê N D A L
Nivîsekarî : E V D O
Berpirsiyarê malhebûnê: H. KARACA
Foto-Maket : J. BERTOLINO
Çap : Îsmet-Şêxo-Raûf

NAVNÎŞAN (adres): K O V A R A A Z A D Î

B.P.378 75625 PARIS CEDEX 13 France

●DIRAV(per)li ser navnîşana A Z A D Î
CCP n° 23 37 449 L Paris/ France

KURDÎSTANA AZA, YEKBÛYÎ, SOSYALÎST!